

**CIGERXWÎN**

**ZEND-AVISTA**  
**DÎWANA 5'A**

**STOKHOLM 1981**

**CIGERXWÎN**

**ZEND-AVISTA**  
**DÎWANA 5'A**

**ÇAPA YEKEM**

**STOKHOLM 1981**

WEŞANÊN ROJA NU :2

Navnîşan : BOX 4038  
141 04 HUDDINGE/SWEDEN

ISBN 91-7672-001-4  
Bokförlaget ROJA NU  
Copyright Cigerxwîn  
Printed in Sweden  
Stockholm 1981

## FEHRESTE

Hêvîdarî .....	34
Ol û Daxwaza Min .....	37
Jin û Jîn û Jîndarî .....	42
Serxwebûn .....	49
Rêzanî .....	55
Partîzanî .....	57
Serbestî û Bîndestî .....	59
Şorişgerî .....	63
Leşkerî .....	67
Piropaganda .....	71
Kadrî .....	75
Ziman û Hînkirina Ziman .....	79
Hîn Bike .....	83
Xwendewarî .....	87
Dezge û Dezgevanî .....	98
Karker û Cotar .....	102
Cotkar .....	104
Jin û Mêr Bi Hevre Di Nav Karde .....	108
Rewşa Kurdistan .....	110
Êlperestî .....	114
Olperestî .....	120
Bilindî Dewlemendî .....	133
Bibin Markisi .....	137
Ajotin û Avjenî .....	145
Nêçîrvanî .....	149

Segvanî .....	151
Fîzîya û Kareva .....	153
Lîztîk û Yarî .....	155
Ola Min .....	157
Rojî û Nimêj .....	161
Berê Reş .....	165
Mihemed Neçûye Ezmana .....	167
Evîn û Evîndarî .....	169
Bazirganî .....	173

## PÊŞGOTİN

QANATE KURDO

Meha avgûstê sala 1980 ji Stokholmê serwerên kova ra kurdi "Roja Nu" dîwana çaran ya şairê me ezîz Cegerxûn ji minra şandibû, ku ez pêşgotinê bo wê binivîsim. Serwerên wê kovarê nivisîbûn: "Em û mamosta Cegerxwîn li wê ramanê bûne yek, wekî di destpêka vê pertokêda pêşgotina te mamostayê mezin hebe.

Em hîvîdarin, ku tu ji mera ser vê efirandinê bîr û bawarîya xwe ango dîtina mîna pêşgotinekê bi rîkî".

Gelî heval û hevkarê delal :

Berê pêşîn ez gelekî şad bûm, ku şervan û têkûşerên kurdan li Evropê hene, teşkil û sazmanên wan hene, ku ew bi pirsên rewşenbîrkirina neteweyê xweva mijûl dibin, dixwezin dîwana Cegerxûn bona xebatkar û tekûşerên iş û karêن ronahîyê çap bikin. Ez gelekî şame, ku we ramana xwe kirîye yek, ku ez bîr û bawarîya xwe mîna pêşgotinê li ser wê diwanê binivîsim. Ew spartin bextewarîke mezine, li jîyîna xweda ez gihîştîme wê rojê, ku bi xwestina we dikarim şixulekî bi xêr û hêja bikim bona neteweyê xwe.

Spartina we li ser çava qebûl dikim, lê divêt hûn bizanîn, ku nivîsandina pêşgotinê bona dîwana şayîre meyiî mezin û hezkirî Cegerxûn ne tiştekî hêsaye. Bona vî karî, bona vî şixûlî divêt meriv li hemû pirsanda zana, hozan û pispor be, bi zanîna xweva çend serîyan li ser Cegerxûnra be; ez xwe hesab nakim merîvê

wusan û bi fikira min pêvîste bêjim, ku heta niha sed car heyf, ku li nav neteweyê meyî bindestda merivên wusan tunene; bi rastî gotî, dibe hebin, lê min navê wan ne bihîstîye, eger hebûna, minê xwe bextewar hesabbikira û ji kovara "Roja Nu" ra bini-vîsiya, ku nivîsandina wê pêşgotinê bona dîwana Cegerxûn bispêrme wî. Lê niha herçend serwerên wê kovarê pêra layq dîtîne, ji minra nivîsiye, ku ez "pêşgotinê ango dîtina xwe mîna pêşgotinê" binivîsim, ez mecbûrim wê xwestinê biqedînim, bînme seri.

Cegerxûn bi reng û rûyê xweva, bi nivîsarên xweva wek teht û kelemên serê çiyayê Kurdistanê here bilinde; sedan sed sal hatine, çûne û bîhirîne, lê ew teht, ew kelem li cîyê xweda bi tîk, qaym û berk mane, Cegerxûn jî li hunerwerîya xweda, li bîr û bawara xweda bi qaym serbilind û serefraz maye û li rîya xweda her diçe û diçe.

Di jîyîna Cegerxûnda li nav her çar parêñ Kurdistanê gelek rojêñ giran qewimîne, li jîyîna xelqê kurdda gelek caran bûye reşebayî, bobelîsk, tofan û baran, lê teht û kelemên serê çiyayê Kurdistanana da-beşkirî li cîyê xweda mane, ne leqîyane; Cegerxûn jî mîna wan teht û keleman li ser bîr û bawara xweda bi qaym, berk rawestaye, ji cîye xwe çep û rast ne leqîyaye, ne hejîyaye, raste-rast li rîya xweda ber bi merem û hebesta xwe diçe û wê here; ew bûye dengbêj û borîjenê serbestîy û azadkirina neteweyê kurd, -ev bû û eve armancan jîyîna wî mîri. Li dor û berê çîya

yên kurdan, li deşt û bestên Kurdistanê xûnavîda xel qê kurd toximê kurdewerî û wetenperwerîyê reşandîye Li tarîx û dîroka kurdanda gelek û gelek zeftkar hâtine, ku rabine ser wan teht û kelemeñ serê çiyayêñ welatê kurdan, xwestine kurdan qir bikin, li nav xwe ña pûç bikin, bihelînin, lê nikarbûne û nikarin bîkin. Ji rojhilat, ji rojava, ji jor(bakur) ji jêr (başûr) gelek û gelek caran dijminan li ser kurd û Kurdistanêda girtine, gelek caran mîrkuj û xûnrêjêñ mîna Cingîsxan, Ayatola û mayatola kurd û Kurdistan kirine nav agir û alavan, talan û tajan kirine, sotîne, kuştine, lê nikarbûne reha kurdan ji binîva bîqurçimînin, nikarbûne û nikarin, çîmkî gelek mîrén mîna Cegerxûn ji nav sîng û berêñ çiyayêñ Kurdistanê ji paşila jinêñ kurd yên delale xûnşîrin û bînge û bînejîya kurdan derketine, rabûne û ala kurdewerîyê û kurdperwerîyê, ala azadkirina kurd û Kurdistanê girtine destê xwe, serwerî û rîbirî li şerê serxwebû na neteweyê xwe kirine. Navê gelek mîrxas, şerkeran û qeremanen li tarîxa kurdanda, xasma li sedsalîyêñ nozda û bîstanda, aşkeraye. Wana jî toximê azadkiriña kurd û Kurdistanê reşandîye, her sal li dû hev ew toxim li nav deşt, mîrg, newal û bestên welatê kurdanda hêşîn dîbin, digihîjin, li nav wanda gelek kulîlk, gul dibişkîvin û dilê keç û xortêñ kurd şâ dikin û pêra jî tînne bîra wan, ku ew gul, ew kulîlk bi xûna mîrxasêñ meydane şerê serxwebûna neteweyê

kurd avreşan bûne, gihîştine û bihar-bihar her sal dil û canê qîz û xortên kurd qal dikin û ew hazir dibin bona rojêñ oxirmê giran, bona roja xîret û namûsê.

Miletê kurd bi navê mîrxas û qeremanêñ şerê serxwebûna welatê xwe fexir û kubar dibe, nek bi tenê bona wê yekê, ku li tarîxêda ew mîrxas û ew qereman bi çek û sîlihanva rabûne, derketine meydana şerê azadkirina miletê xwe, lê wusan jî wana mala xwe, canê xwe û ruhê xwe terxan kirine bo xatirê serxwebûna kurdan, bo xatirê azadîya wan. Miletê kurd wusan jî bi navê şayir û helbestvanêñ xwe fexir û kubar di be, ew qedir û qîmetê wan dizane, bi navê wan serbilinde, çimkî ew şayîr, ew helbestvan ji ber pêş û pa şila jinêñ kurd yên jîr û êgin û zîrek derketine, ji nav şaxêñ Kurdistanê rabûne, derketine meydana şer, li rex qeremanê çekdar wek teht û kelemêñ serê çîyan bi şêranî ala rengê sor, kesk û sipî girtine destê xwe, şer kirine, mala xwe, ruhê xwe, canê xwe terxan kirine bo xatirê azadkirine neteweyê xwe, welatê xwe.

Çaxê ez navê şayîrêñ kurdan, navê helbestvanêñ kurdan tînim bîra xwe, herdem navê hezkerê me, şayîrê me mezin û hêja Cegerxûn tê ser lêvên min, li his û serê minda rûniştîye, ku ewî jî mala xwe, ruhê xwe û canê xwe terxan kirîye bo serbestî û serxwebûna kurdan; dibe raste, ez bêjim li sedsalîya meda şayîr û helbestvanê kurdêñ kurmanc yê herî mezin bi fikir

bîr û bawara xwe pêşketîvam, bi ramana xweva, bi jî-yîn û hunurê xweva weke(mîna) Cegerxûn tune. Cegerxûn bi rewşa xweva, bi efirandinê xweva, bi ramana xweva behra bê berî û bê binîye, gelek girane meriv noqî wê behrê be û binaznbe çi di wê behrêda heye. Bona wê yekê divêt meriv noqvanê zana be û pispor be; ez xwe hesab nakim merivê wusan. Cegerxûn nek bi tenê şayîr û helbestvane, ew wusan jî zana û zanyare, ne rehete li ser hemû efirandinê Cegerxûn li vira binivîsim û fikira xwe bi firevan binivîsim. Lê herçend kovara "Roja Nu" spartîye min, ku ez pêşgotinê bona dîwana wî, bona wî şêrê nav çîyayêñ kurdan binivîsim, ez ni-karim bêjim na, ez mecbûrim qasî qewata xwe, qasî za-nîna xwe çend giliyan binivîsim; lazime ez binivîsim çîmkî "Roja Nu" dixweze wê dîwanê çap ke bona palan û gundî û xebatkarêñ kurd. Di vî işîda ez berpirsiya rim çend giliyan binivîsim.

. . . .

Li sala 1947 li Înstîtûta rohilatnasîyêda ez mi-julî ziman, etnografî û lîtératûra neteweyê kurd dibûm. Li wê înstîtûtêda gelek zanyarêñ rûs yên mezin û navdar dixebeitîn, li nav wanda çend profeserên qedirgir hebûn: Aleksandir Arnoldoviç Frêyman, ew serokê koma îrannasan bû, ez li ber destê wî û bi ser kariya wî mijûlî karê xwe dibûm, İgnatî Yûlianoviç Kraçkovski serokê koma erebnasan bû, akadêmîk Vasîlî Vasîlîevîç Strûvê-serokê înstîtûta rohilatnasîyê bû, Evgêni Edûardoviç Bêrtêls- serokê kafêdra filologîya

îranîyê ya fakûltêta rohilatnasîyê ya zanînga Lênîn-gradê bû û yên din bûn. Mabeyna min û wan xweş bû, wana ez hez dikirim û gelek caran arîkarîya min dikirin, temî û wesîyêtêna baş didane min.

Rojekê ez li sivdera înstîtûta meda rastî profê-sor Kraçkovskî hatim. Ewî ez dame sekinandinê, devê çentê xwe vekir û kitêbek jê derxist, dirêjî min kir got "Xortê delal, han ji tera vê kitêbê, dibe hewasa te pêra hebe, bi kurdî nivîsîne, îrannasê navdar Vlidîmîr Fêdoroviç Mînorskî ji Londonê şandîye, lê binihêre, bixûne, dibe kêrî te be".

Min ew kitêb hilda, lê nihêrî, dît, ku bi herfêñ latînî li ser nivîsîne "Dîwana Cegerxûn", min rûpê-lê wê vekir, li rûyê din dît: şîklê Cegerxûn çapkiri bû, li binîya wîda nivîsî bûn: "Xwedîyê dîwanê". Min fehm kir, ku Cegerxûn xweyîyê dîwanêye, lê min nizan bû Cegerxûn kîye, min navê wî, navê merivê awa nebi-hîstibû, ez fikirim, ketme mitala "Cegerxûn kîye?" çîma "Dîwana Cegerxûn"; li berê ez haj pê nî bûm, ku Cegerxûn şayîre.

Min belgên kitêbê wergerandin, navê çend şîran xwendin, li axiriya kitêbê navnîşa şîran nivîsandi - bûn, min pêşgotin xwend û pê hesîyam, ku kitêb li Sûriyê bi arîkarîya rewşenbirkerên kurd hatîye çap-kirinê, ku Cegerxûn navê şayîri zêdeye, navê wî eslî Şêxmûse, yanê Şêx Mûsaye. Bi naverokên şîren dîwana wî ez pê hesîyam çîma ewî navê "Cegerxûn" li xwe ki-rîye. Ji ber halê qultîya miletê kurd, ji ber derd û

kulê gundi û pale û xebatkarên kurd ew dilêş bûye  
hergav bûye ah û zarê wî, dil û cegera wî xûn girtine,  
sebeb vê yekê ewî navê xwe kirîye Cegerxûn. Bi  
xwendin dîwana wî ez pê hesîyam, ku ew ne şayîrê  
sedsalîya navîne, lê şayîrê zemanê meyî nihaye; hewas  
û kêfa min bi zimanê dîwana wîra hat, kurmancîya wî  
gelek xwes bi min hat, gelek wext bû, ku min ew dî-  
wan hergav bi xwera dibir, ji destê xwe der ne di-  
xist, çaxê ez ji iş û karê xwe azad dibûm, min ew di-  
xwend, çiqas diçû, ewqas hewasa min bi şêr û helbes-  
tênen wîra dihat, her şerekê, her helbestekê ez didame  
hêlana û heyecana. Di wanda derheq derd û kulê mile-  
tê kurd, jîyîn û halê kurdan û şerê wanî serxwebûn  
hatibû nivisandinê. Berê min qet kitêbên nivîskarên  
kurdan yên mîna vê dîwanê ne dîtibûn û ne jî xwendî-  
bûn; li wê dîwanêda berê pêşin min deng û bas yekbûn,  
hevkarîya kurdan bo xatirê serxwebûna welatê wan  
xwend. Bi xwendina wê dîwanê hate ber çavê min dîro-  
ka şerê kurda, serhatî û dîroka zana û hozanên kur-  
dan, min xwe bextewar hesab kir, ku dîwana wusan ke-  
tîye destê min, ku pê hesîyam, ku şayîrekî kurda wu-  
san heye û navê wî Cegerxûne.

Ji welatê Sovêtê der bi saya serê Celadêt Bedir-  
xan û Kamûran Bedirxan nav û dengê Cegerxûn zûva li  
nav her çar parêن kurdi stanêda belav bûbû, herdu mî-  
rên qeremanê şerkerên rewşenbîrkerên neteweyê kurd  
li kovarêن xwe "Hewar", "Roja Nû" û "Sterda" "Ronahî

yêda" herdem şêr û helbestên Cegerxûn çap dikirin û kovarê wan li nav salên 1932 û 1945- da bûbûne bin-ge û binaxa çapkirin û belavkirina efirandinê Cegerxûn. Eger ew kovar tunebûna, ne hatina çapkiri- ne, şêr û helbestên Cegerxûn jî qet çap ne dibûn û xelqê kurd pê ne dihesîya, ku li nav wîda hozan û zana û şayîrên mezin hene, ku yek jî wan Cegerxûne.

Di kovar û rojnamên Celadet Bedirxan û Kamûran Bedirxanda kurdnasê firansî Toma Buwa û Rojê Lësko çend miqalên biçûk derheqa jîyîn, iş û karê Cegerxûn da û derheqa şêr û helbestên wî kurdewerî û weten- perwerîda çap kirine. Bi gilîkî ji welatê Sovêtê der nav û dengê Cegerxûn zûva eşkera bû, her li Sovêtîstanê kesek haj wî mîrî tune bû, navê wî ne bihistibû ne jî efirandinê wî xwendibûn.

Li sala 1952-da min miqalek bi navê "Lîtératûra kurdên derva derheqa halê kurdên Sovêtîstanêda" li kovara "Îstorîya î filologîya stran Vostoka"-da vîp. 3 li Lëningradêda bi zimanê rusî çap kir. Di wêda min çend rêzên şêrên Cegerxûn li ser welatê Sovêtê çap kirin, anîn ber çavêن xwendkaran, ku pê bihesin Cegerxûn di şêrên xweda dinivîse, ku Sovêtîstan dos- tê neteweyê kurde, ku ew terefdar û piştîvanê şerê azadkirina xelqê kurde, ku eskerê sor wê bibe azad- kerê kurd û Kurdistanê, ku xelqê kurd ketîye ser rî- ya Marks û Lénîn û qet tu cara ji wê rê der nakeve.

Li paşê li nav salên 1946-1953-da min li zanînga Lëningradêda dersê zimanê kurdî dida şagirtên kafêrd

ra filolojîya ûraniyê. Bi biryarê wê kafêdrê gerek ew şagirtên kurdi hîn dîbin, biçûna nav kurdêñ Ermenistanê, bibînin ew çawan dijîn û li nav wanda bi praktîkî hîni xeberdana zimanê kurmancî bibin. Havîna sala 1953 min şagirtên xwe M.B.Rûdêñko, R.L.Sabolov, T.N.Paxalîna, A.I.Îvanova, A.A.Grûnbêrg, H.I.Usupov û yên din bi xwera birme praktîkê nav kurdêñ nehiya Abaranê. Berî hingê bextê min lê xistibû, dîwana Cegerxûn ya duduwan jî ketibû destê min. Eva dîwana ji ya pêşin baştir bû, têda nek bi tenê şêr û helbes\_têñ derheqa jîyîn, ayîn, hal û dîroka şerê serxwebûna kurdan hatibûne nivîsandinê, lê wusan jî derheqa dostî, hevkari, azadî û aştî li nav neteweyêñ bindes\_tîda hatibûne nivîsandinê. Şêr û helbestêñ vê dîwanê gelek xwes bûn û min ew dîwan bi xwera bir. Ez û şagirtên min em li gundê Camûşvana mezin cîwar bûn. Hingê Emînê Avdel bi jin û zaruwêñ xweva hatibûne wî gundi, li mala xalê wî Cindîda cî-war bûbûn. Bi xwes\_tina Emînê Avdel ez jî çûm ketme mala xalê wî û tev kulfetê wî cîwar bûm, şagirt jî li otaxêñ dersxanêda cî-war bûn. Hingê min carnan şêrên dîwana Cegerxûn ji Emînra û biçûkêñ mala wîra dixwendin. Ew şêr bi Emîn û zaruwan xwes dihatin. Li paşê min û wîva ramana xwe kire yek, ku ji wê dîwanê şêrên Cegerxûn yên bajarvanîyê (şêr û helbestêñ pêşketî, şûreşgirî, kurdewerî, wetenperwerîyê, dostî û hevkariya netewe yan) hilçinin û cuda li berevokêda bona kurdêñ Sovê-

tê bi herfêن kîrîlîkî (rûsî) çap bikin. Hingê hevalê kî me kurd li komîtêta partîya kamûnîstên Ermenîstanê dixebeitî. Em çûne cem wî, ku ew arîkarî me bike bi tevayî em herne dîwanekê çapxanê lava bikin, ku şerên Cegerxûn yên bijare bi herfêن rûsî bona kurdên Ermenîstanê çap bikin. Ewî hevalî milê xwe ne da ber xwestina me, got: "Ez ci zanim Cegerxûn kîye, belkî koneperest derkeve, dijminê welatê Sovêtê be, zehf ji ewî çend xeberên baş derheqa welatê meda nivîsîne xwe hesab dike bolshevîk, komînist". Ez Emînê Avdel bi dilê xem, por pojman ji otaxa qulixa wî derketin, vegerîyan çûn.

Li sala 1957-da min rêzmanâ xwe ya kurmancî (Gramatîka kurdkogo yazîka (kurmancî) bi zimanê rûsî çap kir. Hingê min pêra layq dît çend şerên Cegerxûn di wê rêzmanêda çap bikim. Min ev şerên jêrîn: "Halê gundiyan", "Reşo û gundi", "Ta kengê emê karker û cotkarê bega bin", "Xwendin", "Pembûwê meye, lê em tazîne", "Heval Pol Robson", "Mehrecana Bêrlînê", "Hozan û şayîrên kurd" di wê rêzmanêda çap kirin (300-310). Di rûpêlê şeşanda derheqa Cegerxûnda min ev xe berên jêrin nivîsîne: "Cegerxûn vîdayûşîisya kurds-kîy poêt Sîrîî, borêts za nasîonalnûyû nêzavîsîmost, dêmokratîyû i osvobojdêniyê narodov Blijnêgo Vostoka ot gnêta împrialîzma" yanê "Cegerxûn şayîrê kurdên Sûrîyê navdare, li helbestêñ xweda ew derdikeve meydana şerê azadkirina neteweyêñ bindest ji bin zulma

împêrialîzmê bo xatirê serxwebûna wane demograti".

Li paşê di nav salên 1963-1966 Ordîxanê Celîl ji Ermenîstanê şandibûne Lênîngradê cem me, ku kursa a-pîrantûrêda hîn be. Çaxê ew hîn dibû, min herdu dîwa nêñ Cegerxûn dane wî, ku bixûne. Li wextekîda ew bû nasê efirandinê Cegerxûn, şer û helbestên wî hez ki rin. Rojekê ewî ji minra got: "Apê Qanat, baş dibe, eger hine şêrên Cegerxûn bi herfên rûsî bona cahilê Ermenîstanê çap bikin". Min got: "Ew meremekî baše, çend sal berê min bi xwe xwest wê xebatê bikim, lê hingê hevalekî qulixdar û berpirsyar li wê pirsêrda arîkarî min ne kir, niha tu bike, ezê arîkarî te bikim, şerê Cegerxûn bijare çap bikin". Ewî şer û helbestên Cegerxûn ji dîwanên wî yê bajarvanîyê derxistin, wergerandne ser herfên rûsî û pêşxeber ji berhe voka wan şêranra bi kumancîya şkestî nivîsî, di wê pêşgotinêda derheqa qedir û qimet û nirxê wan şêran li pirsa civakî û sîyasetîyêda şiro vekir, pêşgotin da min, min ew rast kir û ramana xwe bona çapxana Ermenîstanê nivîsî, ku çapkirina wê berevika şer û helbestên Cegerxûn gelek bi muhîm û feydaye bona kur dîn Ermenîstanê. Ew Berevok li sala 1966 li Ermenîstanê bi lê nihêrîna wêzîrê Eso hate çapkirinê.

Li sala 1966 ji Azîrbecanê kurdekî ji minra namak nivîsî; ewî di nama xweda nivîsibû: "Navê min Eskerov Şamile, ez kurdê nehîya Kelbêcarême, li wê nehîyêda kurd dijîn, min mekteba partîyê li Bakuyê xilas ki-

rîye, niha li nehîya Kelbêcarê li nav kurdanda mijûlî xebata rewşenbîrkirina netewe dibim, mîla min heye li ser lêgerîna lîtératûra kurdî bixebitim, ez lava dikim, tu bi kerema xwe ji minra binîvîsi lîtératûra kurdî heye?, Li kîderê dest dikeve?".

Min bersiva nama Eskerov Şamil nivîsi, ku du dîwanên şayîrekî kurdên Sûriyê li cem min hene, nivîsa rên wî gelek bi qîmet û hêjane, navê wî Cegerxûnê, ezê dîwanan wî ji tera bişînim, tu bixûne, bi fikira min layqe meriv xebateke zanyarî derheqa efirandinê wîda binivîse". Ew qayl bû, name nivîsi, got:"Bi kerema xwe wan herdu dîwanan ji minra bişîne, ezê ser bixebitim, lê bigerim, serederiyê lê bikim, dîsîrtasîya zanyarî li ser efirandinê wîda binivîsim". Min herdu dîwanan Cegerxûn ji Eskerov Şamilra şandin. Sal û nîvek şûnda ew hate Lînîngradê, meheke havîn li mala minda ma, hemû kovar, rojnamayêñ kurmancî (Hewar, Roja Nu, Ronahî, Stêr) û kitêb û pertokên li ser tarîx û kultûra kurdan çapkirî xwendin, ci bona xebata wî zanyarî lazim bû, ewî jê hilçand û sala 1969 bi xêr û silamet dîsîrtasîya xwe "Efirandinê şayîrê kurd Cegerxûn" pawan kir. Xêr ji wê ewî pertokek bi zimanê azerbêcanî "Xelqin şayîr Cegerxûn" çap kir. Di xebatêñ xweda Eskerov Şamil efirandinê Cegerxûn parê ser van koman dike: 1) Şêrên yekbûn û rewşenbîrkirina (ronahîkirina) 2) Şêrên dostîya neteweyê

kurd û neteweyê Sovêtê, 3) Şêrên li ser aştîye li dînyayêda? 4) Şêrên pêşberî şêx û pîrên muftexur.

Li paşî analîza van şêran Eskerov Şamil mijûlî kêş û qafîya (çapa rêzebendê) şêrên Cegerxûn bûye û hatîye ser wê fikirê, ku Cegerxûn şêrên xwe bi çapa rêzebenda û forma muxames, mesnevî, qasid, rûbayî û gezelî li hev anîne lê bi piranî ewî şêrên xwe bi formên bangan nivîsîne, gelek şêrên wî rêzên wan şes bangîne, heftbangîne, heystbangîne, dehbangîne û mîna stranê kurdî bendêن wan li hev têن û bi teqil tê ne gotinê û stranê. Li paşî wan nivîsarêن min li jorê navê wan nivîsandî li gelek nivîsarêن nivîskar û zanyarêن Sovêtîstanêda navê Cegerxûn dihate nivîsan-dinê, dihate gotinê, ku ew şayîrê neteweyê kurdî herî pêşkevtîye, herî dêmocrat û intîrnasînalîye (binê-re "Almanax Kurdskoy Lîtératûrî", Baku, 1959; Nado Mahmudov, Neteweyê kurd, Erêvan, 1959 (bi zimanê Ermenî); Bolşaya Sovêtskaya ênsîklopêdîya, Moskva, 1963, t.24; Jurnal "Drûjba narodov" 1963, N 12 û yên din).

Bi vî cûreyî nav û dengê Cegerxûn li nav Sovêtîstanêda belav bû, biçûk û mezinêن kurd navê wî, şêrên wî bihistine, dixûnin gelekan şêrên wî ezber kirine, li êvarîyanda bi ezber dibêjin; zanyarêن kurd û rohilatnasêن Sovêtê pê hesiyane, ku şayîrekî kurd şû-reşgir, pêşketî û dêmocrat heye, ku navê wî Cegerxûn e. Me eva zanibû çaxê herdu dîwanêن wî pêşîn ketibûne destê me. Niha em pê hesiyane, ku dîwana wî sisî-

yan "Kîme ez" derketîye û niha ji dîwana wî ya çaran hazir bûye bona çap kîrinê. Eger em bi temamî li na-veroka (mezmûna) hemû dîwanên wî binêrin, baş bifi-kîrin, emê bêne ser wê fikirê, ku efirandinê wî bi bîr û bawara xweva, bi nêt û meren û mebestêñ xweva pareve dibin ser van koman: I) Şêr û helbestêñ li ser jîyîn, ayîn û halê kurdan; 2) Şêr û helbestêñ li ser zana, hozan û şayîrêñ kurdan; 3) Şêrêñ dildarîyê û evintîyê; 4) Şêrêñ li ser bajarvanîyê (yêñ dostî û hevkariya neteweyan û aştî li nav wanda) 5) Şêrêñ tarîx û dîroka şerê serxwebûna kurdan, 7) Şêrêñ pêş-berî muftexuran (axa, began, şêx, pîran, bûrjûwazî û kapitalîstan), 8) Şêrêñ pêşberî zulma faşîzmê, 9) Şê-rêñ rewşenbîrkirina (ronahîkirina) neteweyê kurd, 10) Şêrêñ pêşberî dîn, dîyanet û ayîna berê kevnepe-restî, II) Şêrêñ filîsofiyê. Bi cuda pêvîste zanyar û lêgerîker li ser her komeke van şêrêñ Cegerxûn bixebite, bi zanyarî mijûlî analîza (ji hev derxisti-na) wan bibe, qimetê wan, hêjayîya hunurê wan nîşanî xwendevanêñ me bikin. Lê sed car heyf niha zanyarêñ lîtêratûra kurdî tunene, lê ez bawar dikim, ku li paşwextîyê zanyarêñ wusan ji nav neteweyê kurd derkevin, mijûlî wan pîrsan bibin; kî dizane, dibe wextekê li Kurdistana serbixweda înstîtûta lêgerîna lêtêratûra kurdî bê naskirinê bi navê Cegerxûn û di wê înstîtûtêda bi pilanî mijûlî efirandinê wî bibin. Layqe jî bê sazkirinê û zanyrêñ kurd bixebeitin nek

bi tenê li ser lêgerîna şêr û helbestên wî, lê wusan jî li ser nivîsarên wî derheq zimanê kurdî (li ser ferhenga wî kurdî û destûra wî ya zimanê kurdî û yên din). Bi fikir û ramana min efirandinê Cegerxûn bi temamî bi naverokên xweva, bi hunurê nivîsarêva, bi bedewîya nivîsandina xweva ji nivîsarên gelek şayîrên dînyayê bi navdar, şûreşgir û demôqratên niha danaxwe. Eger şêr û helbestên Cegerxûn bihatan wergerandinê ser rûsî, înglisî, fransî û almanî, dînyayê pê bihesîya û bigota eva giliyan rastin, neteweyê kurd dikare xwe bextewar hesab bike, ku şayîrekî wusan mezin, pêşkevtî, demôgrat û intîrnasîonalîst ji nav sîng û berê Kurdistanê derketîye û, helbet, neteweyê kurd dikare bi navê Cegerxûn ferix û kubar be

.. .

Çend gili li ser dîwana Cegerxûn ya çaran pêvîste bêjim. Ew dîwana niha li ber mine, ez bi hewasdar wê dixûnim û mîna berê şêrên wî, helbestên wî bi kurman cîya xwes û şîrin hatine nivîsandinê. Çaxê meriv wê dixûne, qêmîş nake wê dîwanê ji destê xwe derxe, meriv her hewasdare wê bixûne û dermanê dilê xwe têda bibîne, çar û mikane, nêt û meremê xwe li rîya serbestkirina neteweyê kurd têda bixûne, pê bihese, bizanbe Cegerxûn şayîr û dengbêjê ci zemanî û ci bîr û bawarêye.

Şêr û helbestên dîwana Cegerxûn ya çaran bi nave-

roka xweva mîna şêr û helbestêن her sê dîwanêن wî pê şînin. Ew jî bi raman, nêt û meremên xweva li ser jî yîn, hal û şerê serxwebûna neteweyê kurd hatine ni-vîsandinê. Bi texmîn ew parevedibin ser sê koman: I) Şêrêن evintîyê(evindarîyê yan jî dildarîyê); 2) Şêrêن kurdperwerîyê û wetenperwerîyê; 3) Şêrêن jîyîn, ayîna kurdan,yên tarîya wan û Kurdistanê.

Di dîwana Cegerxûn pêşinda şêrêن evindarîyê tek-teka hene, di wêda piranî şêr li ser jîyîn,ayîn, hal û tarîxa kurdan, şerê wan nav xwe û pêşberî stemka-ran, dijminêن derva û hundur hatine nivîsandinê. Di dîwanên wî yên dudu û sisîyanda gelek şêrên wî yên evindarîyê hatine gotinê, mesele, di dîwana wî çaran-da ev şêrên dildarîyê çap bûne: "Dûriya yare" (135), "Yara" (136), "Pîr bûm, dil pîr nabî" (144), "Çep û rast" (142), "Derdê dûrini" (181), "Destê xwe paqijke ji xwînê" (137), "Dil perçe perçe hûr dikî" (196), "Cej nê yar dilxweş dibî" (171), "Name ya derd û xeman" (175), "Bextê sipî" (198), "Zengil" (119), "Gazin ji çine" (173), "Ocaxe yar" (183), "Yar hat civîna min bi şev" (185), "Ev dinya pir xweşe" (131), "Tu zanî maç demanim" (179), "Bi torê bixûn vê namê" (146), "Di ser çavê mera hatî" (160), "Kurdistan" (54), "Guh bide dî-rokê" (199), "Fetwa ya pîrê Mexane" (194), "Şîrin levê" (191), "Me dil daye pertave" (149), "Dilo mizgîn li te şabî" (192), "Penge rû" (177), "Çi bikim bi rojî û ni-mêjê" (92), "Eman hey lê" (201).

Di van şêrên xwe yêv evinîyêda Cegerxûn ah û zar  
dike û ah û zarê wî li ser welat têne kirinê, di wan-  
da ew dibêje û ji xêma dilan dilûvîne, ku ji dûrîya  
evinê derd û kulê wî pir bûne, di wanda ew xebera  
"evin" li şûna xebera "welat", li şûna xebera "Kur-  
distanê" dide xebitandinê. Çaxê ew ji hizkiri, ji dil  
ketî û evina xwera dibêje: "Eman ji derdê dûrîyê", ew  
dixweze bêje, ku ewî dûre ji welatê xwe, ku li wela-  
tê xeribda dijî, ku ew ji derdê dûrîya evina xwe-  
Kurdistanê di xweda ketîye, diponije, ew nîşan dike,  
ku ewî bîra welatê kal û bavê xwe kirîye, ku ew di-  
xweze welatê xwe azad bibîne, bi serbest hemêz ke,  
pê şad be, bigihîje bext û mirazê xwe- Kurdistanê a-  
zad û serbest bibîne. Bi şêrên evintîyê Cegerxûn tê  
ber çavan mîna xortekî evindar, mîna merekî miraz-  
xwez, ku evina wî, mirazê wî serbest û serxwebûna  
kurd û Kurdistanêye.

Mesele :

Pir xweşe, pir xweşe

Ev dinya pir xweşe

Yar pal daye ser min

Rû wek gula geşe

Serbest û azadin

Em dilxweş û şadin

Bê gili û gazin

Bi dil hev dixwazin

Guldestêñ evînê

Pêlêñ derya jînê

Em gihan serbestî

Sed tif li bindestî (133)

Were meyger, bide cema lebaleb

Ku toza bendewarî dawesênim

Delala min dinav destêñ neyara

Dixwazim wê bi zorê rakişênim

Mebêñ seyda Cigerxwîn bûye kale

Divê nemrim heta dilber bibênim. (153)

Were hembêz bikin em hev bi şadî

Berî dijmin me têxî bend û davê

Tu rojî dil disojî lê metirse

Cigerxwîn hişk û xurte wek benavê. (151)

Şêrên Cegerxûn yêñ dildarîyê bi navê "Agir û pêta evinê" (154-159), "Me dil daye Pertavê" (149), "Diyarîya yarê" (135), û yêñ din bi naveroka xweva yêñ hezkirina welatin, di wanda mirazê dilê Cegerxûn, dilxweza wî, evina wî serbestî û serxwebûna kurd û Kurdistanê jîyîna bextewarîya wane, mesele, li helbesta xwe "Agir û pêta evinê"-da ew dibêje :

Evîn ji pêta agirî

Dil girtiye qet namirî

Fêde çine ah û girî

Ahî ji destê te evîn

Nalîn ji ber daxêن dikul  
Jan daye cerg û nav û dil  
Lê, min şikestî pişt û mil  
Ahî ji destê te evîn

Gava ji dilber dûr dibin  
Birîn di dil de kûr dibin  
Sermest û pir rencûr dibin

Ahî ji destê te evîn (156)

Bawar bike li her şêr û helbestên evintîyêda, yên di vê dîwanêda çap bûne, Cegerxûn li paşî ah û zarin kirin li ser evina xwe, li paşî pesnê wê dan, ev esse çend rezên girînî li ser welatê xwe dibêje û xwendevanê xwe dide fehmkirinê, ku ewî bextreşe û mirazkorê, çimkî welatê wî bindeste, ku evîna wî, dilxwezî û bextewariya xort û keçen kurd yên mirazzwez her li zemanê serbestî û azadiya Kurdistanêda wê miyaser be biqede û bê seri.

Çend giliya jî pêvîste li ser şêr û helbestên kurdperwerîyê û wetenperwerîyê binivîsim.

Li jorê li pêşîyê min da xuyankirinê, ku li Sovetistanêda saya serê xebatên kîjan merivan şêr û helbestên Cegerxîn, yên kurdewerîyê kurdperwerîyê, dostî û hevkariya miletêñ bindest ji herdu diwanêñ wî pêşin aşkera bûne. Şêr û helbestên bi vî cûreyî li her du dîwanêñ Cegerxûn yê paşında (dîwana sisîyanda û di vê dîwanêda - dîwana çaranda) gelekin, mesele, li

dîwana çaranda ev şêr û helbestên wî çap bûne: "Destê xwe paqij ke ji xûnê" (137), "Rewşa Welêt" (40), "Bi ser çîyan ketim" (39), "Ji nûva em berjor diçin" (89), "Kî hilgirî vî barê min?" (17), "Ez nizanim ci bêjim" (28), "Ta neşewitin, ronî nadî welêt" (66), "Welatperestî" (68), û yên din. Di van şeranda Cegerxîn dîsan mîna berê dike hewar û gazî, berê xwe li palan, rîncberan, xebatkaran, xwendevanan, zana û hozanêñ kurdan kirîye, diqîre, dibêje kurdno, ji xewa kibîr hişyar bin, xwe nas bikin, hûn kîne, yek bin, bi şeranî derkevne meydana şerê ser xwebûna welat, ji bin destê goveka zulmkarêñ Îranê, Iraqê û Tirkîyê azad bin; di wan şeranda Cegerxûn bernama şerê azadkirna kurd û Kurdistanê nîşanî neteweyê xwe dike. Cegerxûn dibêje: ku kurd bigihîjne merem û mebestê xwe, li pêşiyê pêvîste dijminê nav xwe(axa, began, şexan, pîran, bûr-jûwazîyan û kapîtalîstan) ji welat derxin, mesele, ew dînivîse :

Ev bûye sed salêñ we  
Kûçik dixun malêñ we  
Keşe û şêx û mela  
Li we dikin teşqela  
Axa û mîr û paşa  
Wek hirç û gornepaşa  
Ew tev beg û efendî  
Lê win ji wan re gundi (114)

"Olperest û êlperest,  
Navêñ kurd bibî serbest" (23)

Qata kurdêñ xwedî mal  
Bi dijminre bûn heval (87)

Dijmin ku em derxin bi zor  
Avêñ çeman em bibne jor  
Zaz û hekar û bext û lor

Pir xwes bikin vî warê min (18)

Heta xwînê nerêjin  
Em nikarin bibêjin :

Ku em jî bûne milet  
Xwedî leşker, bi dewlet (86)

Cegerxûn dibêje, ku gundî û xebatkarêñ tirk jî  
mîna gundî û xebatkarêñ kurd li bin destê qata jorîn  
da (sinifa jorînda) ya axa, beg, bûrjûwazî û kapîta-  
listên tirkanda nin, ku ji bo azadkirina xwe herdu  
qatêñ jêrin tirk û kurd bibin yek :

Qatê jêrî tirk û kurd  
Tev birçîne, tev zigurd  
Divê ew dest bidin hev  
Xebat bikin roj û şev  
Bixin destê xwe ew dar  
Herdû bibin xwedî par  
Yanî bibin du dewlet  
Dostê hev bin du milet (87)

Bibin bi dost û heval  
 Xwedî zêr û xwedî mal  
 Destûr bibî dîmuqrat  
 Dîmuqrata Rojhilat  
 Qad û xwendin tevayî  
 Wekhevî û birayî. (47)  
 Ez bilûra Marksım  
 Dengê rista bêkesim  
 Ji hêvîyan avisim  
 Ez nizanim çi bêjim (28)

Di şêra xwe "Ta neşewitin ronî nadî welêt" (66)de  
 Cegerxûn dibêje :

Zenda vemalin, bikevin Zagros  
 Erişî dijmin bikin bi harî  
 Em şêrên çiya, piling û ejder  
 Zaz û bext û lor, sor û hekarî  
 Rabin bibin yek, destan bidin hev  
 Ji bo me divêt tenê hişîyarî  
 Sazde milyon kurd gernas û mîrxas  
 Dane serê xwe ew reşe-çarî  
 Ta kengî dijîn perçe, perçe kurd ?  
 Ma kî dixwazî vî iş û karî !?  
 Raste bindestî karê qelsa ye  
 Ji ser xwe rakin wê em neçarî (66)

Rastê, kesek vî iş û halê neteweyê kurd qayl nabe  
 nek bi tenê ew naxweze vî iş û karî, wusan jî hemû  
 26

dost û cinarêni wî xêrxwez dixwezin, ku kurd serxwe - bûn bijîn. Çaxê xeberdan tê kirinê, ku neteweyê kurd bi tomerî 20 mîlionî zedetire, (li Tirkîyê 10 mîlionin, li İraqê sê mîlionin, li İranê pênc mîlionin, li Sûriyê mîlioneke) xêrxwez û dostêni kurdan dibêjin : "divêt dewleta kurdan serxwebûn hebe". Raste, divêt serxwebûna kurdan hebe, lê neteweyê kurd ji destî dabeşkirina welatê xwe ketîye bindestê sê-çar gurên har, (hukmeta İranê, İraqê û Tirkîyê), ew tu caran naxwezin kurd û Kurdistan bi serxwebûn bin, ew di-xwezin heta hetayê parçê Kurdistanê li bin destê wanda bimînin. Dibe li paşwextîyê hal û wext û zeman bê guhastinê li wan her çar welatanda kêm û zêde qayl bin avtonomîyê bidne kurdan, ew jî avtonomîya nav li ser mîna avtonomîya kurdan li İraqêda.

Niha em dibînin, ku dinya parevebûye ser sê komên mezin: 1. Dinya sîstêma welatên sosialistîyê, 2-Dinya sîstêma welatên kapitalîstan û împêrialîstan, 3-Dinya welatên serxwebûn yên bêteref. Welatên İranê, İraqê, Tirkîyê û yên din li Rojhilata nezik dikevne nav dinya welatên sîstêma serxwebûn. Ew welat jî dibînin eger hal û wextê dinyayê tê guhastinê û eger xêr û bêr û kara wan di wê guhastinêda hebe, ew siyasetîya xwe derva diguhêzin: yan xwe li alîyê dewletên sîstêma sosialistîyê digirin, yan jî xwe li alîyê dewletên sîstêma kapitalizmê digirin û bi dizîva dibne dosta û hevalên împêrializmê.

Bi xeberdan, bi zar her kes dibêje "Li zemanê hil şandina (rûxandina) sistêma koloniyêda, helbet, mafê neteweyê kurd heye bi serxwebûn û serbest bijî". Ku xelqê kurd serbest be, bi serxwebûn bijî, lazime hukmetên stemkar destê xwe ji parçê Kurdistanê bikişînin, bihêlin kurd bi serbest û serefraz bijîn, yan jî pêvîste neteweyê kurd hemû hêz û qewatên xwe bike yet, şer bike û bi zorê serxwebûna xwe bi destê xweva bîne. Ji van herdu rîyan rîya pêşin bi destî hukmetên stemkarê kurdan qet tu caran nabe û nayê kirinê, rîya paşin her rîya raste, şûreşgirîye, divêt di wê rêda yekîtiya kurdan hebe, ew bi destê zorê serxwebûna xwe bi destê xweva bînin. Ji ber vê yekê Cegerxûn dibêje :

Heta xwînê nerêjin

Em nikarin bibêjin :

Ku em jî bûne milet

Xwedî lesker, bi dewlet (86)

Zanim siyaset tev derew

Divê ku kurd rabin ji xew

Destan bidin top û tiving

Li ser çiyan qêrîn û deng

Ji nav welêt derxin neyar

Qada me namênit beyar (100)

Hewar û gazîyên Cegerxûn: "Şer kin bo xatirê wela", xwînê nerêjin, kesek ji mera nabêje milet"ras-tin. Lê pêvîste serkarê tevgera neteweyê kurdan

baş bizanbin, ku kengê pêvîste kurd bi top û tiving derkevine meydana şerê serxwebûna kurd û Kurdistanê. Bi top û tiving, xişt û xenceran li paşî şûrşa Okyab\_rê li nav salên 1918-1932 da kurd rabûn, şerkirin pêş berî stemkarêن xwe. Hingê wextê wan çek û silihan bû wî wextî stemkarêن kurdan sist bûn, mîna niha tank balafir (firoke), rakêtên wan tune bûn, eger yekîtî-ya kurdan wî wextî hebûya, eger axa, beg û şêxên kur\_da xayîn derneketana, terefdar û arîkarên kurdan ji welatê derva hebûna, kurdêñ serbest bibûna, ser ketana. Lê sed car mixabin, wusan neqewimî. Ew sal û zeman çûn, derbas bûne, niha hal û hewalê welatêñ stemkarêñ kurdan hatîye guhastinê, ew bi hêz û gewat bûne, bûne xwedî leşkerêñ bi tertîb û tendurust, bi tank, top, firoke, rakêtên şer, hemû sazmanîya hukme ta wan, hemû teşkîletêñ wan yên partîyê, yên rewşen-kirinê bûne hêlinâ şovîniyê, faşîzmîyê. Eger niha kurd bi top, tiving û reşas, bê arîkariya hundur û derva rabin, li serê çîya şer bikin, ew nikarin li pêşberî leşkerê bi tank, firoke, rakêt teyax bikin, dibe şerê wan wê wextekî bikişîne, lê divêt ew bizan bin, ku ew di şerê wusanda ser nakevin, wê belaş xû-na xwe birêjin, gundêñ xwe bajarêñ xwe bidne ber tan kan, firokan birûxînin û malê xwe bidne talan û ta-jankirinê. Şerê kurdan yê serxwebûna wan niha pêvîste bi şerê hemû işker û karkerêñ tirk, ereb û farsan va bê girêdanê, divêt pale, gundi, rêncber, xebatker

û bîrewarêñ gund û bajarêñ tirk û kurd yêñ ereb û kurd û yêñ fars û kurd bi hevra, bi tevayî rabin pêşberî kevneperekstan û împêrialîstan, pêşberî zulma hukmeta dîktatorî, bo xatirê sazmanîya here demografi, bo xatirê dostî, hevkarî û wekhevîya kurd û ereb kurd û tirk, kurd û fars. Eve armanca nivîsarêñ Cegherxûn. Li cîkî di ew dibêje : "Em şer naxwezin, lê ew tê ber derê me" (58)

Şêrêñ wesa naxwazin  
Ne gili û ne gazin  
Milet hemî bibî şêr  
Nebî jor û nebî jêr  
Bê tizbî û def û xişt  
Welêt bikin wek bihişt  
Ne bindestî ne jî zor  
Bere bimrî qata jor  
Tev de em bibne yek qat  
Destûr bibî dîmuqrat  
Pale bibin xwedî kar  
Zevî bidin dest cotar  
.....  
.....  
Dozameye serxwebûn  
Lê dixwazin pêşveçûn (52)

Di dîwanêda wusan jî çend şêr û helbestên mezin li ser ayîn û tarîxa neteweyê kurd hatine çapkîrinê, mesele: "Em şer naxwezin, lê ew tê ber derê me" (58)

"Alegemşê" (83), "Hovîtiya dijmin" (20), û yên din. Ev şêr û helbest ne mîna şêr û helbestên evintîyê û kurdperwerîyêne, ev ji wan mezintir, her yek ji wan wek sê-çar-pênc-deh-donzdeh beligin, ew mîna serhatî yan û dastanan dirêjin û bi naveroka xweva ew jî mîna wan li ser jîyîn, ayîn edetê kurdan û dîroka wan têne gotinê. Bi gilikî bi naveroka xweva ew serhatî û çîrokin, lê bi tertîb û tundirusta xweva bi tegil û li hev anîna bendêr rêzêni bi rengê şêran û helbestan hatine nivîsandinê. Şêr û helbestên Cegerxûn yên bi vî cûreyî nivîsandî li dîwana wî pêşinda jî hene, mesele, "Serxwebûna mirîşkan" (47-50), "Şahnama şehîdan" (50-56), li dîwana duduwarda "Cotkar û zevî" (102-107), "Serpêhatîya Ciwan û dewlet" (108-121), "Tarîxa sultan Saledînê kurd" (126-129), "Serpehatîya Şepal û Sitêr" (111-118) û li dîwana sisîyanda: "Kîme ez" (9-16), "Pîra merivxur" (61-68), "Zincîr ji gerdenim şikest" (84-94), "Rencberê bi rûmet" (169-178), "Nivî sarek bi yar" (188-195) û yên din.

Ku xwendevanêne me delal baş haj qîmet û nirxê van serhatîya û dastana (poêman) bin, divêt meriv başqe mijûlî lêgerîna tertîbi, tendurustî û sazmanîya wan be, guh bide ser naveroka wan, xemlandina wan û xemberêne wane bedewî. Eva jî meseleke mezine û bi hewas dare li pirsêne lêgerîna efirandinê Cegerxûnda. Em hîvîdarin li paşwestîyê zanyarêne lîtératûra kurd wê vê pirsê safî û zelal bikin.

Li kutayêda ez divêt bêjim, ku ev serhatî û das-tan tev wan komên jorêن min navê wan nivîsandî xiz-neke gelek giranbihane, ew bi tevayî ênsiklopêdiya jîyîn, ayîn hal û tarîxa neteweye kurdane, ênsiklopêdîya şerê wî serxwebûne li nav salêن destpeka sedsalîya bîsta heta van salêن paşin. Merivê baş herçar dîwanêن wî bixûne, mijûlî naveroka wan û sazmaniya wan be, wê bê ser wê fikirê û wê ramanê, û bêje bi rastî her çar dîwanêن Cegerxûn ênsiklopêdiya peydabûn û pêşveçûna neteweyê kurde, ya helketin, serketin û daketina şerê serxwebûna kurdane, ênsiklopêdîya rabûn û runiştina kurdaye, ya hevbendîya kurd, ereb, fars û tirkane.

Her şereke Cegerxûn, her helbesteke her çar dîwanêن Cegerxûn ji nav dil û hinavê wî, ji kuranîya dilê wî, ji hiş û aqilê wî gihîştî û safî û ji behra zanina wî hatine gotin û nivîsandinê; peydabûna wan, efirandina wan bi hal û wextê dinyayêra girêdayîye , ji ber hal û jîyîna kurdêن bindestî û zerandî û ji ber roja wane reş û bextê wanî kor şêr û helbestên Cegerxûn hatine hunandinê. Di wanda wîne û şiklê kurd û Kurdistanê bi destî hostayê xeberên bedewî kişandi nê. Kesek di xemîl, nexş nitra wanda şikbir nabe, gişk bi rast û rasteqînin. Lî pêvîste ji bîr nekin, ku ew li cî û wextê xweda giranbiha û bi nirxin. Bin-ga naveroka her çar dîwanên wî, bîr û bawara efiran-dinêن wî ewin, ku şerevan û tekuşerên neteweyê kurd

zanibin, ji bîr nekin, ku rîya azadkirina kurd û Kur distanê dûr û dirêj û girane, bona wê yekê niha, li berê pêşin lazime yekîtiya hemû kom û partîyên wan, hebe lazime li pêşin ew bixebeitin, nehêlin milet qir bibe, pûç be, divêt milet xwedi bikin, ku ew xwe wun da neke, zimanê xwe, kultûra xwe, yekîtiya xwe pêwan bike, bona vê yekê divêt kom û partîyên wan li her dera bi serbixwe hebin, divêt komên wan (yêngortan, yênginan, yê xebatkaran, yêngundî û pala, komên ronahikirina milet, yêngapkirin û belavkirina kovar û rojnamên kurdi) bi aşkera û binîva hebin û tevgirêda na wan bi hevra hebe, divêt tevgiredana wan wusan ji bi hemû komên pêşkevtî yêngereb, tirk û farsanra hebe, bi tev wan bixebeitin, pêşberî kevneperestan û imperialîstan şer bikin, şer bikin pêşberî hukmeta dikatorî û şovînîyê şer bikin bo xatirê serbestiya xwe bo xatirê dostî, biratî, hevkari û aşitî li nav kurd û ereb, kurd û tirk, kurd û fars. Eve bîr û bawara Cegerxûn, eve dilxweziya wî, merem û mebesta efirandinê wî.

Leningrad, 20.9.1980





Ji destê wî derxin welatê xwe tev  
Bi êrîş herin pêş bi roj û bi şev  
Bi dost û birabin hemî jar û mest  
Niho bûye çil sal ku min ev dixwest  
Welat xweş bikin em nemênin neyar  
Mirov tev bi hevre bibin dost û yar  
Bi hevre bibin em bicarek heval  
Li ber hev menêrin bi can û bi mal  
Ne sînor bimênin, ne jî paseport  
Li herder bi hevre bijîn qîz û xort  
Ji warê me barkin ci tiştênebaş  
Di her war û cîde nemênin li paş  
Cihanê bikin em bi rengê bihişt  
Li nav me nemênin xwedî zor û xişt  
Bi hevre bijîn em bi rist û hebûn  
Ne ko ez dibêjim wekî Efletûn  
Hezar beyt û pêsed nivîsin bi vîn  
Di heftê û çaran ciger bûye xwîn

## OL Ü DAXWAZA MİN

Ji dil guh bidêre min ey bira

Ji bo te bihûnim dir ü gewhera

Dixwazim bibêjim bi rast ü dirist

Bere bêne ser min hezar kurt ü pist

Bi tore biçênim gulên sor ü zer

Bi ava riwê xwe, bi xwîna ciger

Ewan avbidim, da vebin terh ü ges

Ku xweşbin bi wan sed dilên pir nexwes

Eger qenc ü naqenc, eve zarê kurd

Bihane li gund ü li bajare kurd

Bi hûnan ü ristin, bi şîwa minin

Ne min ew dizîne, ji mîwa minin

Ku çend sale min ew kul ü rence xwar

Dixwezim te rakim ji xew ey xewar

Çep ü rast ü hawîr binêre cihan

Hemî kes şiyarbû ji xew nagihan

Tenê man di xewde wekî dêw ü dîn

Ji derdê we seyda ciger bûye xwîn

Diqîrim, dinalim, wekî çeng ü ney

Li dil min kişandin hezar dax ü key

Kurê Kawis ü Kohreş ü Erdeşêr

Nizanim çira wer we ber daye jêr?





Bi govend û dîlan, bi dans û bi ger  
Di bîra kesî qet neyên ceng û şer  
Şirîn bête dansê û Nesrîn biken  
Bi talan û yaxma herin lêv û çen  
Mey û ney bi hevre me serxwes bikin  
Pit û Keyn û Şerîn me rûges bikin  
Bi sazêre Nazê bibî nazedar  
Ji ezmanê şadî perî bêne xwar  
Li herder bilindbin timî xwendegah  
Belengaz nemênin hemî bibne şah  
Beg û şêx û axa bibin kevnepirs  
Li herder nemênin, ne zor û ne tirs  
Li eywanê Kesra bikin guft û go  
Bi şadî bijîn tev, ci lê û ci lo  
Li herder hebî ronîya kareva  
Reşî qet nehêlin di nêva şeva  
Tirêن bê bi him-him, gelî bidne deng  
Bi balave rabin kur û şox û şeng  
Li ser van sitêran bikin geşt û ger  
Çi halan û talan, ci lêdan û şer !  
Biçük wek gul û çîçekan geş bibin  
Dilê dê û bavan bi wan xwes bibin  
Li ser van çeman em pira çêbikin  
Li her cî û şûnan sera lêbikin

Ku rista welatê me bî wekhevi  
ji herkesre mal û sewal û zevî

Li herder wekî hev bibin şar û gund  
Bijîn tev bi şadî hemî serbilind





Nebêje ji herkes ku zengîntire  
Ku hozan û rêzan bî hê çêtire  
  
Bilindî, ciwanî hebin pir xweşe  
Belam rûmeta wî ne çerm û leşe  
  
Bi destê xwe bigre du sed mûm û find  
Li herder binêre, çi şar û çi gund  
  
Yekî peydeke, lê bizan ey ciwan  
Guhê xwe mede bejn û çav û riwan  
  
Dilovan û zana û serbest û mîr  
Di rojêñ şerande bibî mîreşêr  
  
Çığa jêre dilnerm û rûgeş bibî  
Bizane dilê wî bi te xweş dibî  
Ji wî pêve dil med kesî, bûyî jin  
Ji herdû rexanve divê hezkirin  
  
Keçanî, jinîti, ne rengêñ hevin  
Di jînêde çêkin bi hevre tevin  
  
Di jînêde mîr zanibe kaniye  
Tenê zanibe ko te ew anîye  
  
Tu pingavê jîn û tu derya evîn  
Belam çare nîne, divêtin civîn  
  
Kirasek tenik wergire lê bi şev  
Tu bişkîne jêre şekir lê bi dev  
  
Tu pêre xwe berde ji heftê du car  
Nivîna te jêre nebî kevnewar

Pera jê mexwaze, bere ew bidî  
Tucaran ji wîre mebêje gidî

Tu çavêن xwe bigre ji kincê biha  
Nebêje ji wîre dixwazim niha

Bi wîre mexwaze herî her never  
Ji derve ku hat zû tu rabe ji ber

Bi devken û rûgeş bi berde here  
Eger dil nexwesbî hinik jêgere

Belam jêre şekir ji lêvan birêj  
Bi nazî û yarı tu pirsan bibêj

Li ber wî tu rûne li ber dil bide  
Tu destê wî bigre hinek tevbide

Wî dilxweş bike lê bi nûz û bi naz  
Ji çavan, ji lêvan tu maçek bixwaz

Bi hevre eger win herin carekê  
Li çayxanekê yan herin barekê

Li hawîr venêre hela kî heye ?  
Çi bêjî, tu jêre bibêje weye

Li modan mepirse, tenê paqijî  
Tu malê xwedîke bi bîr û mijî

Tu rûgeşbe kengî ku mîvan hebin  
Nexasim, hevalê hevalê te bin ?

Ku bêjî çi bîne, werîne sivik  
Tu carek mebê na, bi kîn û bi rik





Devê xwe bi firçê bişo xuşke can  
Bila bê qerêj bin ziman û diran

Bi sabûnê destan bişo pak û rind  
Li bajêr bijî yan li kon û li gund

Divê paqijî tim li bîra te bî  
Ji bo ko di malê xweşî zêde bî

Xesû, jinbir û jintî û ew hewî  
Ji bîra xwe bavêj nema lew-lewî

Bi hevre bijîn wek xweh û wek bira  
Di malê xwendin hebî ew çira

Tu hînbe hemî tiştê başê kevin  
Teşî ristin û jendin û hem tevin

Di berve hemî tiştê nû çêdibin  
Jin û mîr bi hevre gerek hîn bibin

Tu çav bermede destê bav û bira  
Li cem xwe meke wek senem tim pera

Eger hatina te bi destê te bî  
Ewê rûmeta te gelek zêde bî

Binêre ji mêşê ku têt hingivîn  
Li cem herkesî ew dibî wer şirîn

## SERXWEBÛN

Bira zanibe pir xweşe serxwebûn  
Bi destê weye hatin û tev hebûn

Tu azad û serbest û pir payedar  
Bi destê tene tevde rêjîm û dar

Xwedî dewlet û leşker û perleman  
Xwedî nav û nîşan û ala û nan

Di nav dewletande dibî serbilind  
Li hindir dibil tev xwedî mal û gund

Li her dewletek qunselek dê hebî  
Şiyarê welat û mirovên te bî

Hezaranê dezgeh bi dest têne kar  
Xwedîke bi wan leşkerek navîdar

Firokan tu çêke, gelek tang û top  
Bi şûnve bihêle gelek rêç û şop

Tu sînor û derbend û bajar û gund  
Biparêze hingî dibî serbilind

Dikarî bi zanîn û zor û hiner  
Tu rista xwe deynî li her şûn û der

Zimanê te şerîn û pir xwes dibî  
Riwê herkesi dê bi te ges bibî

Ji nûve bibêje kurê kême ez ?  
Gelek mîr û gernas û pir çême ez

Xwedî dewlet û zar û pir leşkerim  
Kurê Koreş û Kawisim, Ejderim

Belam pir hesanî mebîn serxwebûn  
Qelen pir girane hemî tirs û xûn

Bi zindan û talan, bi kuştin, bi şer  
Xebat û lebat û çiwîn û veger

Divê gorîyên pir di vê rê bidin  
Bi serxwe nikarin bijîn ger nedin

Heta ko nedin mal û can û hebûn  
Bi destê xwe naxin kesek serxwebûn

Hezaranhezar mîr di vê rê diçin  
Di vê rîde em wekhevin mîr û jin

Ku bajar û gundêñ te kavil nebin  
Hemî arezûyêñ te tavil nebin

Welatê te tevde gemar û qerêj  
Li ser wî bira rabe xwînê birêj

Bi xwînê tu paqijke gerş û gemar  
Mehêle ku bostek bimêni beyar

Eger mal û can û serê xwe nedî  
Te ev serxwebûn wilo xwes nedî

Di vê rîde bimre tu dilşad û ges  
Gula sor di sînga te perwaye xwes

Li ber pê birêje tu mal û hebûn  
Mebêje ku bimrim çiye serxwebûn ?

Ewê ko bi Cengîzre cengê biki  
Divê rengê Rustem li kengê biki  
  
Eger em dixwazin ku azad bibin  
Li ser vê sitêra xwe dilşad bibin  
  
Divê em serê xo bidin ber şegan  
Netirsin bi carek ji dengê segan  
  
Ewê ko xwe berdî Ferat û Qizil  
Gerek avjenî zanibî ew bi mil  
  
Ewê ko ji mal û ji canê xwe têr  
Dixwazî biki ew şerê Erdesêr  
  
Ewê ko bi xencer neparêzî cî  
Li ber ço wekî go diçî her diçî  
  
Eger ko bi xurtî neparêzî rez  
Ji hawîr dixun wî rezî hirç û pez  
  
Eger ranekî xweş li ber bexçe sênc  
Ker û golikê herme nav çar û pênc  
  
Dixwazim bizanî ko barek giran  
Venakin girêka me dest û diran  
  
Eger em ne mîrxas û gernasî bin  
Nikarin di vê rêve derbasî bin  
  
Eger em bitirsin ji dar û ji ben  
Nikarin vî barê giran hilgirin  
  
Eger em ne jîrbin û dest nedne hev  
Nikarin girêkê vekin em bi dev

Ne sedrence lîstik, çi nehberk û dam  
Divê ko berî dijminan herne dam

Çeqûber li me çêbikin em diçin  
Divâm ko bi hevre tu car pevneçin

Bi xurtî bi hevre herin ceng û şer  
Bi mal û ziman û bi can û ciger

Bi hevre bikin em şerê borcewaz  
Çi pale, çi cotar, çi azadîxwaz

Binêr olperest û hemî êlperest  
Bi hevre şerê me dikin dest bi dest

Tenê em nikarin bibin yek enî  
Li ber royê dijmin, bese ezbenî

Heta kengî her wa emê perçe bin ?  
Ji solên beganre wekî firçe bin

Ji olê, ji êlê nêma kar dikin  
Dixwazin bi kurdî me bindar bikin

Ne kurdin ne jî wek me azadîxwaz  
Hemî kevnexwazin dibil borcewaz

Welatê me xwarin bi zor û bi dîn  
Ji derdê ewan min ciger bûye xwîn

Dinalim, diqîrim wekû çeng û ney  
Li sîngê kişandin hezar dax û key

Dixwazim şiyarbin ji dil xwendevan  
Jin û mîr û gundî, hemî palevan

Bi hevre herin pêş bi rîp û bi xap  
Bi ser wande bişkin wekî şîp û şap  
  
Heçî ko bixwazî bi rast û ji dil  
Digel me bi pêşde herî mil bi mil  
  
Kurê kurde ew jî dibî serbilind  
Birayê meye ew kesê pak û rind  
  
Belam ew kesê dest bidî dest neyar  
Neyarê meye wek sehê dîn û har  
  
Divê bête kuştin wekî mar û mişk  
Meger mehdera wî bikin dê û xuşk  
  
Belam çende bûrîne ev mah û sal  
Kudik qet nebûne keroşk û xezal  
  
Tu cewrên guran jî ci mîr û ci jin  
Kedîkî, xwedîkî dibin qet bixin ?  
  
Neraste ku bêjin hemî em yekin  
We yan em bibêjin dibî tewbe kin ?  
  
Ku çêlikê maran bi jehr û mirin  
Weharenge cewrên guran tim gurin  
  
Divê dar û ferman bi destê me bin  
Di sêncâ mede ba dever qet nebin  
  
Şiyarbin, li kar bin wekî cin û jîr  
Bi pêşde bibin em mirovên feqîr  
  
Hevalo tu rûmet bide palevan  
Ewe pişt û hana te rojêن giran

Ewe ê ku dezgeh bi pêşve dibî  
Li kû danişî ew weyaxud çibî ?  
Hevalê teye ew, çi tirk û çi firs  
Ji kû ye? li kû ye? kiye? lê mepirs  
Çi partî bi te bê û bawer bikî  
Nebî ko ji wîre xwe gawir bikî  
Tenê hoşîyar be, ne derwêş û dîn  
Digel wî here lê ne vîn û evîn  
Eger ko dikarî tu alî bike  
Heçî raste pêre hevalî bike

## RÊZANÎ

Tu rêzan be carek siyaset bixwîn  
Bi vê xwendinê rêcîka xwe bibîn  
  
Bide pêşîya me wekî pehlewan  
Bi zanîn me derbas bike, xwendevan  
  
Eger bûyî carek tu rêzan û jîr  
Ji bo me dibî rojekê xweş wezîr  
  
Dikarî xebatek mezin pir bikî  
Berîkê tijî gewher û dir bikî  
  
Mijûlbe bi zanîn û hem torevan  
Bibe payedarek di nêva cihan  
  
Bilîze bi zanîn di nav dewleta  
Bibe jîr û hozan di nav mîleta  
  
Bi paye serê me bilindbî bi te  
Bi zanîn çi bêjî guhê me li te  
  
Ji bo me li her der bibe bervedêr  
Di rojên şerande bibe xurtemêr  
  
Siyaset û tarîx û tora û rist  
Bixwîne bi hevre ciwan û dirist  
  
Bibe jîr û zana di her çax û dem  
Ji ser me tu rake çi zor û setem  
  
Tu rêzan be qurban xweşe zanebûn  
Hebûn çêtire tim ji "na" û nebûn

Tu hozan û rêzan be ey xwendewar  
Bi van herdiwan dê bibî navîdar

Ji miletre başbe ku bû karbidest  
Bizane ku millet ji me ev dixwest

Dixwazim tu zû-zû bibî hoşîyar  
Nebî zorperes bî bira wek neyar ?

Serê te bilinde dema rast herî  
Emanet, ji kesre nebî wek terî

Dilê xwe mebe mal û zêr û pera  
Gelek jîn xweşê lê bi rastî, bira

Ji miletre carek dibî semiyân  
Mehêle ku carek bibî lê ziyan

Ji bo te bere ew bibî dost û yar  
Mirovê teres bî, ji jînê çi kar ?

Xebata ji miletre karê teye  
Bizane ku ew jî şiyarê teye

Bi rastî bi wîre eger xweş biçî  
Çi bêjî ji wîre ewê bêni cî

## PARTİZANÎ

Bibe partîzanek bi rist û dirist

Digel partîzanan here dest bi dest

Ji miletre rê xweş vekin rengê şêr

Eger xurtemêrî bibe wek sitêr

Tu ronî bide karker û gundiya

Tu xweşke dilê bav û xuşk û dîya

Tivingê tu bigre girêde tu rext

Herin ser çiya, yan ji text, yan ji bext

Bibe parti û hem bibe partîzan

Eger serbilindî dixwazî, bizaran

Nikarî bibî serbilind, navgiran

Heta ko di şerde nebî wek beran

Li ser van çiyan ko nekî qîr û ceng

Bi êrîş û hawar û halan û deng

Tu nabî serefraz û azad û kurd

Li çolan tu dimrî wekî Yezdîgurd

Bi dijminre çendan bibî dost û yar

Dibî rençber û koleyê koledar

Çiqas şerm û pîse wilo dil bi tirs

Dibî koleyê turk û tazî û firs

Kurê Keyqubad û kurê Erdesêr

Çi şerme wilo ko te ser daye jêr

Here ser çiya lê bi top û tiving  
Şerê dijminê kurd bike wek piling

Te dijmin deranî dibî xweş mezin  
Bi lîl têne pêş te kemerkêr û jin

Li Eywanê Kesra dibî şehreyar  
Xwedî rist û destûr û ferman û dar

Dibî payedar û xwedî mîr û pişt  
Welatê xwe yekser dikî wek bihişt

Dibî wek çira geş di nêv rojhilat  
Bi te geş dibin tev çiya û kelat

Divê bîr û bawer bibî wekhevî  
Xwedî par û pişk bin bi mal û zevî

Eger wek dibêjim biki, yan bibî  
Derê zêrzemînê li min dê vebî

Bi paye bibin em hemî serbilind  
Li we dê binêrin hemî şox û rind

Di xan û serande bijîn dilxwesi  
Ji nav me biqeşti, herî çavresi

## SERBESTÎ Û BINDESTÎ

Tu serbest bijî pir xweşe ev jiyan

Ne tenha ez û tu, belê tev cihan

Tu serbest bibêje, tu serbest biger

Tu serbest bixwaze, tu serbest biner

Tu serbest bilîze, tu serbest bixwe

Tu çibkî bike ger bikarî bi xwe ?

Mehêle ziyana te bighê kesî

Di kar û xebatê bibe Markisi

Tu kara xwe pêşkêş bike bo hemî

Bira û mirovin hemî ademî

Bibe rêberê karker û palevan

Wekî roj tu tava xwe berdî cihan

Tu pir teng menêre li royê zemîn

Eger ko sezabî, bibe dûrebîn

Belam ger di qada xwe serbest nejî

Bizane tu tava xwe nadî xwe jî

Tu xwîna xwe birjêne serbest dibî

Divê rê çikûs bî tu bindest dibî

Tu serbestîyê wer hesanî mebîn

Hevîrek sitrandî bi ronik û xwîn

Ne şerme hezar sal tu bindest dijî

Çi bêjim, bi van gotinan napijî ?

Divê ko bixwêni, bibî xwendewar  
Di bîr û mijîde nemêni gemar

Xwe paqij bikî dest bidî xencerê  
Bi nav û bi nîşan bijî wek berê

Ji ser xwe tu rake vî barê giran  
Di cenga neyaran bibe xweş beran

Qerêj girtiye xencera nêhrizî  
Mirovê bi cewher tucar narizî

Dizanim kurê kîye ey serbilind  
Bi destê xwe avakirin şar û gund

Dibênim bilindin li hawîr welat  
Hezar birc û eywan û gund û kelat

Bicarek ji rûmet, ji payê tijî  
Nizanim çira wer tu bindest dijî ?

Serê xo tu rake ji xew carekê  
Hezar pez mexel têñ li bin darekê

Heçî dest birî xencera Erdeşêr  
Di qada xwede ew dijî xurtemêr

Mebe qelsemêr û bibe serbilind  
Di şehrande rûne, çidkî li gund ?

Di bin destê dijminde sed sal dijî  
Li nik min tu bûye girara rijî

Gelek kal û rij û kelê bêtewaş  
Bi pêşve tu naçî, diçî berbipaş

Ji bo te dirêjim dir û gewheran  
Serê te me êşand bi gurzê giran

Dixwazim bibî pehlewanek mezin  
Ji ber te ku dijmin hemî rabezin

Ne bindest be carek, ne kolê neyar  
Di qada xwede xweş bijî payedar

Bibe serbilind û bibe serfiraz  
Di bin darê dijminde bindest meraz

Bizane ko serbestî dilşadîye  
Tiji payedarî û azadîye

Di bin destê dijmin bi pîsî mejî  
Bi mîrî tu bimre bi xurtî bijî

Dibêjim te jî hêm dibêjim xwe jî  
Bi hevre bibin yek bi dilpaqijî

Nebin rencherê dijminê har û dîn  
Ku bindest û jar û perîşan nejîn

Bi xwîna xwe paqij bikin em welêt  
Di royê neyarde bibin ar û pêt

Bipiqin di binde bela hilweşî  
Di qada mede ew nebêni xweşî

Li hawîr herin, bêñ û halan bikin  
Ku xencer di laşê wî kalan bikin

Serê wî wekî go li ber kaşıwan  
Herî, bê ji hawîrve tif bê riwan

Li ser sêpiyan em ewî darvekin  
Pezê wî, rezê wî hemî parvekin  
  
Welatê xwe xweşkin bikin wek bihişt  
Me navên, ne rîş û ne şas û ne xişt  
  
Bibin leşkerek pir bi tîn û bi hêz  
Cihanê bikin yek, çi sînor û xêz ?  
  
Di qada xwede serbilind em bijîn  
Di gorêde zor û setem bêñ rizîn  
  
Bi serbest herin, bêñ li her cî û der  
Veşêrin di tingê hebûnêde şer

## ŞORİŞGÊRÎ

Dizanim di dilde tu şorişgerî  
Di vê rêde nemrî tu jê nagerî

Bibe canfidayek bi nav û bi deng  
Digel dijminê kurd bi êrîş û ceng

Tu rextan girêde bibe nijdevan  
Bi kom û bi leşker wekî Erdewan

Bi top û tivingan herin ser çiya  
Tu bistîne tola jin û sêwiya

Tu êrîş bike dijminê hirç û hov  
Ji bo girtîyan jî bibe xweşmirov

Heçî ko birîn bûn tu derman bike  
Bi wanre bi qurban û heyran bike

Bi dîlanre her dem tu qencî bike  
Bi wanre bi hişkî û rencî meke

Tu êrîş bike ser heçî şer dikin  
Bi xurtî ji qada xwe wan derbikin

Li dijmin bisoje tu sênc û çeper  
Bike ko nema karibin bêne şer

Di erxêde singo li sîngê bide  
Hemî mal û can tev di cengê bide

Wekî pehlewanan sivik herne şer  
Ku dijmin şikest win sivik bidne ser

Bi pêşde tu bajo ji dijmin metirs  
Heçî hate kuştin li wan qet mepirs

Bila tim pelaxtin li bîra te bî  
Bi sozên neyaran nebî ewle bî ?

Hemî mal û dewlet li cem wî hene  
Ku dijmin şikestin hemî ên tene

Tu destê xwe mavêje pertal û mal  
Ji bona we tev dê bimênin, heval

Şikestin di şerde ji bona te kar  
Ne ya te, belam zanibe ya neyar

Eger ko te dijmin şikandin bi zor  
Dimênin ji bo we hemî tor û zor

Tu zanî li herder çine ceng û şer  
Bi pêşde çiwîne, bi paşde veger

Bi tektîk bi paşde, bi pêşde here  
Ku dijmin şikandin nivişkê şere

Tenê zanibe şer hemî xap û rîp  
Menêre ku dijmin xwedî tang û tîp

Eger mileték xwes bivê serxwebûn  
Gerek xwes birêjî di vê rêde xûn

Eger kurd şiyarbin, bivên şerkirin  
Di nav herdû çavêن xwe deynin mirin

Çiqas leşkerê dijmina bêñ bi lek  
Nikarin xwe bigrin li ber we demek

Mebêje ku dijmin pire, bêjimar  
Dehê canfida bin, dikarin hezar

Tucar nakelî xweş girara pira  
Pirîti ne kare di şerde, bira

Xwedî bawerî bî, li xwe ewle bî  
Bere dijminê te ji te zêde bî

Jinişkave lêxe, bike qîr û deng  
Ji hawîrve êrîş bike ser bi ceng

Tijîke dilê dijminê xwe ji tirs  
Eger kême yan zêdeye, jê metirs

Bi şev çêtire ko herî ser neyar  
Li paş we bere tim hebin nobedar

Eger ko herî ser neyaran bi şev  
Ji wîre tu rê nîne, tenhaye rev

Di şerde divê ko wekî cin bibî  
Du hêkan li hevdî yekê kun bibî

Şikestin ji dijminre herdem bixwaz  
Ji ber dijminê xo mekin gaze-gaz

Eger ko şikestin xwe bikne du bir  
Hinik şer bikin lê bi kîn û bi gir

Hinek jî bi paşde herin lê sivik  
Li cîkî xwe bigrin bilind û belik

Ji nû şer bikin da hevalên li paş  
Bikarin xelasbin, nebin çewt û şas

Cihê xwe sivik bermedin bo neyar  
Bi xurtî şerê wî bikin hoşiyar  
  
Belam bêne bîra xwe tim pêşveçûn  
Eger ko dixwazî ji dil serxwebûn  
  
Bizane hevalê delal, şerkirin  
Li cem serfirazan hebûn û mirin  
  
Eger sax bimêni dijî serxwedar  
Eger hatî kuştin dibî payedar  
  
Bizan serxwebûna we jîna weye  
Belam payedarı bi xwîna weye

## LEŞKERÎ

Bibe leşkerê kurd here ser çiya  
Li ber dijminê xo tu bigre riya

Bi pêşde herin em bi top û tiving  
Bikin em bi xurtî bi dijminre ceng

Tu bişkêne dijmin li bajar û gund  
Ji nûve dibin payedar û bilind

Eger bête kuştin dibî payedar  
Bi navê te ava dibin gund û şar

Bi navê we leşkergehan dê vekin  
Ku navê kurên xwe bi navê wekin

Eger sax bimêni dibî serfiraz  
Di qada xwede dê bijî tim bi naz

Jin û mîr bi lîlan û dans û çepik  
Bi sertas û nîşan û şûr û lepik

Di çaryan û kolanve leşker bimeş  
Ku serdar bibêjî we "Roja we xweş"

Dilê herkesî dê bi we xweş bibî  
Riwê herkesî dê bi we geş bibî

Keçik dê li ser we hemî pevbiçin  
Dilê şox û şengan hemî qiç-qiçin

Bibe leşkerê kurd û gernas û mîr  
Li sînga te nîşan bibin sade zêr

Bibe leşkerê kurd, xweşe leşkerî  
Tu pêwanê milet, welatperwerî  
Serê te bilindbî biçî asîman  
Li ser te bibêjin bi dil ristevan  
Eger xo nesojin heçî serbilind  
Kiyê ronîya xwe bidî şar û gund  
Tu azadîyê avnedî ger bi xwîn  
Ku xwînê nerêjin nikarin bijîn  
Serê xurtemêran pira serxwebûn  
Bi xwîna me milet dibêni hebûn  
Hemî paye û rûmete leşkerî  
Tijî dewlemendî, welatperwerî  
Bi pêşve herî payedar rengê fil  
Perîrû ji bo te bikin lîle-lîl  
Dilê dot û xuşkan gelek xweş dikî  
Riwê dê û bavan gelek ges dikî  
Bi xwîna xwe serbestîyê avdidî  
Disojî ji bona me pertav didî  
Li tangê siwarbe bibe payedar  
Bi xurtî tu êriş bike ser neyar  
Ji qada xwe derxe bibe Erdeşîr  
Li Zagrosê Kardo bibe xurtemêr  
Ne şerme kurê Nayrî û Mîdîya  
Li ber destê dijmin bibin wek miya

Kurê Hor û Mîtan û Kardox û Kurd  
Di bin destê dijmin bimênin zigurd  
  
Bese derkeve ser çiya wek piling  
Bi êrîş û halan û qêrîn û deng  
  
Di royê neyarde bibin ar û pêt  
Bi xwîna me sorbin hemî lat û hêt  
  
Bi topan bi pêşde herin wek beran  
Bi tangêن mezin hem bi komên giran  
  
Viyetnam û Laos û Kembodîya  
Li paş xwe bihêle, kurê Mîdîya  
  
Ne şerme ku bênav û bêdeng bijî  
Ji bo te bibêjim çi fortêن rijî ?  
  
Ji ber xwe, ji ber te fehêtkarim ez  
Ji rewşa welatê xwe rûsarim ez  
  
Ji bo te çi bêjim ezê dil bi kul  
Nawêrim bibêjim ne kurdî ji dil  
  
Dema ko ne kurd bûn me ev şax û deşt  
Bi xwîna xwe avdan, kirin wek bihişt  
  
Ji dijminre pir xwes dikir leşkerî  
Tenê wî li nav me rijand berberî  
  
Hezar bend û êl bûn nezan û reben  
Ku zencîr li gerden û mil tim bi ben  
  
Ji dijminre em leşker û pehlewan  
Bi gernasîya xwe me deng da cihan

Çirandin me sînor û tîpêñ Ecem  
Di sînga neyarê neyar bûn kelem  
Tenê em ji hevre neyar û bi rik  
Ji xwîna me axa welêt bû pirik  
  
Şiyarbe bibe leşkerek canfida  
Vejêne tu paya Mîtan û Meda  
  
Bira leşkerî tim nimêja teye  
Çilo paşde mayin qerêja teye  
  
Bibe leşkerê kurd û pir peyadar  
Bibe dijminê dijmin û koledar

## PIROPAGANDA

Tu hînbe pogande çi rast û derew  
Ji xelkêre bêje tu pirsên qelew  
  
Tu êrîş bike dijminê xo bi dev  
Çi rast û derew bin bike tevlîhev  
  
Tu lat û çiyayêñ mezin berde ser  
Bizane pogande jî nifsek ji şer  
  
Çi tiştê bi kêrî te bê raste ew  
Bere tev derew bin wekû maste ew  
  
Di şerde bibêje me ew kuştine  
Di cikî ne xweşde me ew hiştine  
  
Timî bêje dijmin wekî hirç û hov  
Di gurdêñ mede hîç nehiştin mirov  
  
Didin ber şewatê çi mizgeft û dêr  
Zikê jin û kalan çirandin bi kêr  
  
Biçûkan didin ber devê tang û top  
Bi xwînê seyandin hemî şûn û şop  
  
Bibêjin ko dijmin birîndar û dîl  
Jin û kal û zarok, weza û dexîl  
  
Bi hevre didî ber devê tang û top  
Belê em şerê wî dikin qope-qop  
  
Di nav dijminande bike hevrikî  
Perîşan û birçî çilo şer bikî ?

Dubendî di navde heye berberî  
Bibêje ku dijmin biwe çend kerî

Di nav wande dostên me jî pir hene  
Şiyarin, li karin, li benda mene

Mebêjin ko dijmin ji me bêtire  
Bicarek mebêjin ji me çêtire

Çiqas bêne kuştin mekin eşkera  
Bere tim jimara we kêm bit bira

Ji derve bibêjin ku em jar û mest  
Bibêjin ku dijmin ci kevneperek ?

Ji dîlanre çêbin gelek çêtire  
Mebêjin ku dijmin ji me bêtire

Şerê dijminê xwe bi halan bikin  
Nebî jar û kêman jî talan bikin

Eger haşîti xwest werê ber xwede  
Belam şer ji destê xwe qet bermeye

Li alîkî haştî, li alîkî ceng  
Bi destek qelem bî bi destek tifeng

Eger dijminê we şikest bidne ser  
Ji qada xwe derxin bi zor û bi şer

Cihê ko we girt xwes bike wek bihişt  
Ji bo ko hemî kes bibin dost û pişt

Ji gundan mexweze ci tiştî bi zor  
Çi dan we bihayê wê hildin li jor

Meger dost û dijmin weyaxud çibî  
Bibêje ji bona we ew şer dibî  
  
Bikin ko hemî kes bibin hoşîyar  
Jibo ko digel we bibin dost û yar  
  
Li paş dijminên xwe hina peydakin  
Veşartî bihêlin bila şer nekin  
  
Bi şev şer bikin, bi roj herne kar  
Bibin wek qelawiz li dijmin şiyar  
  
Piran hilwesênin bi pişqîn û top  
Li dijmin bidin ew li her şûn û şop  
  
Bibin şevger û wek çetan canfîda  
Ku xwînê birêjin di qada xweda  
  
Bi rojê di rengê perişan û mest  
Çi pîşênu ku dijmin dikî bixne dest  
  
Ji bona we rêkin veşartî bi şev  
Bi şêfre dikarin sivik bidne hev  
  
Bere jin di vê rê hevalê we bin  
Ne ko dost û yar û delalê we bin  
  
Bere bibne rêber, bibne rêçenas  
Ji wan têñ gelek xap û rîp û finas  
  
Di karê xwede jin dibî wek keleş  
Çi pê bê di vê rê gelek qenc û xwes  
  
Belam tim divê ko tenê bernedin  
Bi dest dijminanve xwe zû berdidin

Çığas nazedar ciwan û keçin  
Bi xortên ciwanre ji rê derdiçin  
Poganda bi kar tê bo herkesî  
Peran jêre deynin deh û bîst û sî  
Bi îzge,ziman û bi kovar û dest  
Bi bîr û bi gotin, bi daxwaz û hest  
Çi tiştî bikin ew li kara weye  
Mebêjî ku ev kara bê toreye

## KADRÎ

Bibe kadirek jîrek û pehlewan  
Li ser xwe tu bigre çi barên giran

Di nav bendekêde bibe rîberek  
Heye ko di rojek bibî serwerek

Di karê xwede xwes bibe bîrewer  
Çi tiştên gerekbin bixwîne ji ber

Hişê te mezinbî û bîra te kûr  
Li her tiştî meyza bike kûr û dûr

Bi nermî bibêje, meke qîre-qîr  
Bizane ko herçî li hember te jîr

Ji wî tim tu bistêne, kêmtil bidê  
Tu pêre bi nermî here ser sedê

Mebêje nizanî, dijûnan meke  
Bi nermî tu sînga xwe jêre veke

Çi tiştê nizanî tu jê dûrkeve  
Eger zanibî xwes di ên kûrkeve

Eger pêşberê te gelek zane bî  
Emanet, li nik wî tu erzan nebî

Çi bêjî mebê na, belam jê birev  
Tu ava wî şêlû bike lê bi dev

Ji wî cî xwe çenke here cîkî dî  
Cihê ko tu zanî, xwe jê bernedî

Eger ew mela bî ji olê bipirs  
Ji şas û riha wî tucaran metirs

Tu alî belengaz û jara bike  
Tu êrişî herdem neyaran bike

Mebêje ku ola te carek derew  
Belam xwes bibêje tu pirsên qelew

Belam ew bitirsî tu tim bipirs  
Ji aş û ji bajar, ji Şam û ji Xurs

Bibêje çi tiştê ko kar tê heye  
Bizane civata tu tê a teye

Ji qadê mijûlbe, ji zor û setem  
Dilê wan tijîke ji derd û ji xem

Eger kadirek zane bî, pir şiyar  
Bi destê xwe bigre tu tim pirsiyar

Bi axîn bibêje gelo ew çiye  
Çima kurd li her der wilo birçiye?

Di bin destê şêx û begande reben  
Bi dest wî nemaye bihayê kefen

Bi kurtî, bibe kadirek aferîn  
Ku herkes ji bo te bibê aferîn

Tu çêke, tu lêke , wekî hostekî  
Bi herkesre xwesbe wekî dostekî

Tu çêke meger ko nerast derkevî  
Heye carekê ko tu qenc berkevî

Ji bo partiya te çi qencbî bike  
Li pêşî hevalan çi rençbî bike

Tu pirsa me kurdan bixwîn carekê  
Hezar pez mexel têñ li bin darekê

Dixwazim ko ew dar û sîber tu bî  
Veşartî bihêle çi tiştê dibî

Li her kes tu ewle mebe ey heval,  
Li ser çêm binêre hemî qîrş û qal

Di nava hevalan meke qeşmerî  
Ji şêx û beganre mebe wek terî

Temaşeke kûr-kûr li pirsên qelew  
Li kar û ziyanê, ne rast û derew

Dibî ko derewbî û kara me bî  
Dibî ko jî rastbî, ziyana me bî

Tu her dem xwe dûrî ziyanê bike  
Tu doza hebûn û jiyanê bike

Derew tiştekî pir nebaşe ji dil  
Bi wê pêşve naçî tucaran şuxul

Di tiştêñ bi karde diristin derew  
Ji kesre mebêje tu sozên qelew

Çi bêjî, divê ko tu jêre bikî  
Weyan alîkarî tu pêre bikî

Tu tim bêje ko karibim dê bikim  
Eger ko nekî dê bibêjî çikim ?

Hevalên xwe hînke bi bîna fire  
Li ber wî tu barêن giran hilgire  
Mebêje tu pîsî, nikarî biki  
Bibêje dixwazî çilo çêbikî ?  
Li cem te çi peyda dibî jêre bêj  
Bide naskirin pê, çi kurt û dirêj  
Çi tiştê li cem te tu derxe ji dil  
Ji bo ko di dilde nebin derd û kul  
Bide komika ser xwere, wek bira  
Mebêje çiloye, mebêje çira ?

## ZİMAN Ü HÎNKIRINA ZİMAN

Vejêne zimanê xwe ey xwendevan,

Nebûye milet hîç kesek bê ziman

Zimanê me xoş û xeroş û ciwan

Eger baş bizanî tu nakî ziyan

Tu kurmanciya xwe ji bîra nekî

Eger baş nizanî divê zêdekkî

Elîfba û dîwan û ristan bixwîn

Heta ko wekî min nebî dil bi xwîn

Binêre zimanê te çend dewlemend

Li bajêr, tu carek xwe bîghêne gund

Bibêne çi şêrîne ev reng ziman

Çi payebilind û çi rûmetgiran

Bi pirsên xwe nazik, bi dengan sivik

Ne pirsek biyanî bî nabî girik

Tu paqijke zarê xwe şêrîn bike

Bi kurdî tu baxêv û qêrîn bike

Tu binvîse, çêke hezaran nivişt

Niviştanax, li herder ji wan bibne mişt

Wî bîghêne rêza zimanêñ mezin

Bi nosîn û ristin, bi kêş û wezin

Zimanê biyanî dixwêni çira

Zimanê xwe carek naxwêni, bira ?

Sedan sal, hezaran zimanê meye  
Wekî me di bin destê dijmindeye

Çi gernas û mîre di meydanê ceng  
Ne şûr û ne mertal, ne top û tifeng

Xwe parast ji dijmin wekî pehlewan  
Gelek afirandin wî pirsên ciwan

Meger lê xuyane hinek toz û jeng  
Ne gunhê wîye, em şiyarbûn dereng

Eger ko hebûna me Firdewsiyek  
Weyan Xaniyek, yan jî Kercosiyek

Zimanê me xwestir dibû ji farisi  
Belam bûye nanê ceh û garisi

Li alîkî Lor û li alîkî Gor  
Li alîkî Kurmanc û Kelhor û Sor

Wekî me gelek perçene tev li jêr  
Kesî guh nedaye li mizgeft û dêr

Mirişo bi tazî me tazî dikan  
Di rojêde pênc car me gazî dikan

Li mizgeftê tazî dibêjin mela  
Binêrin çi deng tê ji dêrên fila

Bi tazî dixwênin wekî taziyan  
Dijîn em bi hovî, çiye ew jiyan ?

Bi çîrok û helbeste û folkilor  
Bi paye zimanê me xwes çûye jor

Di ristêde carek mebê bêkese  
Ji bo payedarı Hesarı bese  
  
Cizîrî û Xanî, çi gernase ew  
Wekî Dicle û Zab û Arase ew  
  
Siyahpoş û Nalî û Batî bibîn  
Tu Miksî û Nûrî û Hacî bixwîn  
  
Tu ristên evan Şehsiwaran bikêş  
Bi daxwaz û pirsên qelew çûne pêş  
  
Bi lêvên gulân wan şikandin şiker  
Ku hingî bimênin, bixwênin ji ber  
  
Li bûka ciwanî kirin xeml û xêz  
Li meydanê tore bezîn pir bi hêz  
  
Bi xema xwe dir siftine wan gelek  
Bi saza xwe awaz gihadîn felek  
  
Ku yaqût û elmas û mircan bi rist  
Bi hûnan ristin civandin dirist  
  
Ji bûka zimanre ku pêşkêşkirin  
Zimanê meyê xweş bi pêşve birin  
  
Niha jî hinek nû bi pêşve diçin  
Jin û mîr û kal û ciwan û keçin  
  
Bi tîrên ji bîrê duran qul dikin  
Bi xwêdanê xaman gulân şil dikin  
  
Bi awir cewahir dikin parepar  
Ko millet bi wan awiran bû şiyar

Serê xo ji xew rake, şerm û fehêt  
Mexeyde çi bêjim li bejna me têt  
  
Zimanê xwe her dem bixwîne ji dil  
Were da bi hevre herin mil bi mil  
  
Li alîkî destêن xwe bavêن tiving  
Mehêle zimanê te jî bigrî zeng  
  
Meger ko zimanek ne her tişte lê  
Milet bê ziman wek girara kelê  
  
Zimanê me xoşe ne sade qerêj  
Eger yek nizanî tu jêre bibêj  
  
Eger raste hozanî, ey birewer  
Riya rast eve ez dibêن pêde wer  
  
Tu rêzan û hozan û hem xwendevan  
Çiman wer dixwazî bimêni nezan  
  
Eger min dirêjkir li te pirsiyar  
Dixwezim tu siyarbî ey xwendewar  
  
Dizanim ko xwendin ciraye çira  
Çima xwe li me ges nakî ey bira ?

## HÎN BIKE

Tu hînî zimanan bibe ey ciwan  
Ne tenha tu kurdî, li pêş te cihan  
Eger ko zimanêñ mezin zanîbî  
Xem û kul ji ser te bi wan radibî  
Dibî rengê bilbil bi awaz û deng  
Dibî payedarek bilind û çeleng  
Li herder dikarî herî berbi pêş  
Bicarek li dil nacivin derd û êş  
Bi herkes evîndar û şêrîn dibî  
Bi rêzaniya xwe tu zêrîn dibî  
Bixwîne zimanan gelek kûr û dûr  
Zimanê te xweş tûj dibî rengê şûr  
Li herder xwe derbas dikî bêfedî  
Li ber pêşberên xwe tu nabî gidî  
Dikarî ji minre tu bibî tercuman  
Bizane,bixwêne, tu nakî ziyan  
Tu hînbe, tu hînke hemî xort û keç  
Tu meghuwêze tiştek bi xwarî û leç  
Tu rûsî bixwêne, tu çînî bizan  
Firansî ji berke, çiye ê nezan ?  
Ji berke zimanê xweşê ingilîz  
Bide hînkirin ji hemî xort û qîz

Bi turkî bixwêne, bi kurdî bizan  
Bi tazî û fîrsî bibe Mobezan

Ji rêve biçûkên xwe hînkin ziman  
Zimanên biyanî , bilind û giran

Eger zanîbî xweş zimanek mezin  
Biyanî zimanê te jî nadizin

Zimanê xwe pêşve bibe bê qerêj  
Bike gewher û dir, li herder birêj

Tu pîrsên ciwan û sivik têxe nav  
Ji nav wî tu bavê heçî pûç û xav

Çi peyva qelew bî tu nazik bike  
Çi tiştê bedew bî bi bazik bike

Ko zarê te şerîn û bûk û keçe  
Ne pir xav û pûçe, ne xwar û leçe

Eger ko tu hozanekî pir mezin  
Tu pîrsên xwe deyne bi kêş û wezin

Ku zarê te kurdîcîyek dewlemed  
Belam rojekê jî te pê qet nexwend

Bi rêzaniya xwe tu benda dikî  
Çiman wer zimanê xwe winda dikî ?

Di rêzaniyêde dibî wek Lênîn  
Zimanzaniyêde dibî pêkenîn

Zimanê te çewte, zimanê te xwar  
Li ber dijmînê xwe weza û hejar

Nexwendî, neristî perişan û mest  
Neyarê welatê te ji ev dixwest  
  
Bixwêne, bibêne çiye ew ziman  
Çiqas paqij û nazik û pir ciwan  
  
Ji helbest û ristan tiji gewhere  
Di çirok û pirsan wekî mermere  
  
Tiji serpêhatî, sitran û delal  
Ko Şêrîn û Nesrîn dibêjin, heval  
  
Gelek dewlemende wekî farisî  
Belam bûye nanê ceh û garisi  
  
Hezar şîwe-zarin ji hev dûrketî  
Hemî şermesarin bi yek şûr ketî  
  
Zimanên biyanî êrîş birne ser  
Li hawîr şikandin, çirandin çeper  
  
Gelek pirs û gotin xwe berdane nav  
Hinik pir stûrin, hinek pir zirav  
  
Heta bûne şîwe, ji hev dûrketin  
Bi paşde şikestin nexweş raketin  
  
Divê em ji nûve wî paqij bikin  
Bi sal û deman em xwe lê gij bikin  
  
Bi destûr û ristin wî bajone pêş  
Ji wî dûr bikin em hemî derd û eş  
  
Bi tîpêñ xweyê nû tu zû hîn bibe  
Li ser paşveçûna wî xengîn bibe

Çi bêjim ji bo te, bi xwe xwendewar ?  
Eger guh nedêrî, li kê kim hewar ?  
Şirîne zimanê te wek hingivîn  
Evîna Xec û Lalexan û Şirîn  
Birêse,bihûne wekû gewheran  
Li ser nazenîn û keleş esmeran  
Tu dewlet li darxe, ziman xweş dibî  
Riwê dilrevayan bi wî geş dibî

## XWENDEWARÎ

Tu xortê ciwanî, tu zana û jîr  
Xebatê bike xweş bi tektîk û bîr  
  
Bixwêne, bibêne mirovên şiyar  
Gihan ser sitêran, tenê bendewar  
  
Ne şerme, tu jî xwendewarê meye  
Meger ev nepakî ne karê weye  
  
Belam zanibe ko tu berpirsîyar  
Eger ko xwe bispêrî destê neyar  
  
Cihan bû du perçe çep û raste, lê  
Bi rastî li nik min du pirsên kelê  
  
Eger rast dixwazî bibêjim, heval  
Bi miletve rabe, şine kevnemal ?  
  
Di nav kevn û nûde heye ceng û şer  
Heçî kevne hawîr xwe kirye çeper  
  
Belam nû bi êrîş diçî ser kevin  
Tenê zû bi zû jî kevin narevin  
  
Li ber xwe didin ew çi gernas û xurt  
Tenê herçî tiştên kevin jîne kurt  
  
Nikarin li ber xwe bidin ta bi her  
Heçî hişke dimrî, dijîn şîn û ter  
  
Belam herçî nû jî dibin kevn û kal  
Di serve diborin hinek mah û sal

Yekî dî ji nûve wesan tête ser  
Ji cî derdixî lê bi ceng û bi şer  
Civakî wehaye, weharenge jîn  
Nizanim ji kû ev stêrik rijîn ?  
Gelek tiştê tarî li ber min hene  
Dibî awirên te ne wek yêne mene  
Binêre ku qata bilind sedyeke  
Ji kurdan ko qata nizim lek-leke  
Eger rast tu kurdî, miletperwerî  
Bi xurtî xwe berde li ber vî berî  
Ji kêre dixwazî xebatê biki ?  
Ji bo kê tu doza felatê dikî ?  
Eger kevnperestî bi rastî bibêj  
Tu ava riwê min bicarek merêj  
Belam qenc bizane tu naçî seri  
Li pêş xwe binêre çirav û herî  
Dibî ko bi xapan bixî dest xwe dar  
Belam pêşve naçî, ne jî berxwedar  
Ku kevnarexwazî niho nameşî  
Tenê par û pişka teye rûresî  
Civatan tu çêke bi dilpaqijî  
Meger ko xebata te xweş napijî  
Xebatê bike bo belengazê kurd  
Mirovên perişan, mirovên zigurd

Bike ayina xwe riya Markisi  
Tu kara xwe carek didî herkesî  
  
Eger bav û kalên hina pir mezin  
Ne şerme bi çewti li pey rabezin ?  
  
Ne bavê teye ew mirovê nezan  
Mirovi, kurê kurdî, ey xwendevan  
  
Tu jêre dixwêni, tu jêre dikî  
Bi wî tim divê ko xwe navdar bikî  
  
Bibêje kurê kurd û kurdê kurim  
Dilê xo tucaran ji wî nagirim  
  
Bi wî serbilindî, bi wî payedar  
Ji wîre divê ko bibî xwendewar  
  
Ji wîre xebatê bikî roj û şev  
Bi mal û bi can û bi xam û bi dev  
  
Bi wî her tenê em dibin serbilind  
Li bajêr tu rûnî weyaxud li gund  
  
Heçî êl û olin, tu dûrî here  
Ji guh xo tu bavê bicarek pere  
  
Eger bê, welatê te serbest bibî  
Tu serbest û azad û serdest dibî  
  
Eger te welat û te dewlet hebin  
Derên dewlemendî li te dê vebin  
  
Dibêjim, dizanim tu guhdareki  
Xwe nefroşe dijmin ji bo kareki

Qelawiz û Altax, ji bona pere  
Bizane ji dijmin re jinawere

Tu dijmin bi karê xwe dilxweş dikî  
Li nav miletê xwe xwe rûres dikî

Ji tarîx û milet bitirs rojekê  
Li te dê cihan bit wekî dojekê

Bidin ber riwên te tif û sed dujîn  
Ko hingî ji bo te ci hêjaye jîn ?

Çiman dê bi paye neçî berleman ?  
Ji dijminre bo ci dibî dergevan ?

Ji dijmin metirse tu jê çêtirî  
Li bin lat û hîman geya namirî

Eger bête kuştin di rêça welat  
Bi xwîna te şîn tê hinara felat

Meger ko tu dimrî bi dilpaqijî  
Dikin cejn û şahî bi navê te jî

Mirin ger weha bî, bi xêr bê mirin  
Li ser herdû çavêن xwe dê hilgirin

Bibore ku tiştê me got zêde bin  
Dibî lekedarî jî hin tê hebin

Eger ez nebêjim gunehkar dibim  
Li nik miletê xwe şîl û sar dibim

Mebîne xwe carek wesa sergiran  
Tu guhdêre carek li ber van diran

Mebêje ku xwenda û zana û jîr  
Çikim ez ji pirsên yekî kal û pîr ?

Serê min sipî bû di vê tevgerê  
Ejî wek te xort bûm, diçûm der ji rê

Me jîna xwe borand bi vê teqreqê  
Me lingêñ xwe kotin di nêva feqê

Zilindar û tehli gelek min vexwar  
Ku heta niha jî nebûm bextiyar

Bi ya min bikin lê wekî min mekin  
Hevalêñ bi rastî dirav û çekin

Ko herdû ketin dest bizan bêgoman  
Hemî kes li te kom dibî bê eman

Tu kasek ji jehrê û tasek şekir  
Li nik xobihêle bi destê Bekir

Tu jehrê bide dijminê dil bi kul  
Tu şekir bide ê ko dost bî ji dil

Ji bo te bizan aşgerînek divê  
Ji wîre ji te aferînek divê

Ji xwe dûr bike herçî bêjî heme  
Weyaxud bibêjî ejî wek teme

Bi hevre du ser nakevin yek beroş  
Bi hevre neyarî gelek bêqidoş

Divê pir şiyar bî, nebî ewle bî  
Meger ew hevalê te lawê te bî

Xwe mespêre dijmin bi sündê mezin

Ku darên me kurmî nebin narizin

Çi tiştê bihîst zû bide ber refeş

Eger qenc û xoş bin weyaxud nexwêş

Tu rêzan be herdem hezar xap û fen

Çi zanî bilîzî, mirovê reben ?

Belam xap û rîpan li milet meke

Tu sînga xwe sade ji wîre veke

Tenê hin veşartî hene wan mebêj

Serê te bi wanre dîbit xwar û gêj

Bi tenha nikarî tu karî bikî

Bizane li her cî xwedî hevrikî

Tu destan dirêjke ji bo herkesî

Bizane ku yek nabî wek bîst û sî

Bi hevre zibare çi karek mezin

Yeka-yek li meydanê hesp nabezin

Bi gotin, bi nosîn bikin tev xebat

Bizan xwînrijandin felata welat

Bi bîna fireh karibî kar bikî

Gelek çêtire bo bibî hevrikî

Eger bend û partî hebin xem niye

Belam ger bizanin ko rastî çiye

Divê bidne ber xwe timî rastîyê

Nebî wek berê herne dilxwastîyê ?

Bi rê bigre ger tu welatperwerî  
Bizane ji kêre tu xweş rencberî

Ji rêzanîyê dûr mexe xuşke jin  
Xuyane li herder jinên pir mezin

Ku şêr şêre carek çi jin û çi mîr  
Metîrsêne carek bi mizgeft û dêr

Li meydan û qoşê ne an û ne ïn  
Gelek car di hespan diborin mehîn

Bipirse çi gernase ev şêr û gur  
Demek lephilanîn, demek zêr û dur

Heçî miletin tevde wek hev bizan  
Bike ceng û şer tim li hember dizan

Mirovî, biratî, ne xewn û derew  
Wekî hev dijîn tev çi ev û çi ew

Bi hevre şerê dijminan em bikin  
Eger kûr binêrî ne em hevrikin

Hemî jar û yek bend û dost û heval  
Tenê dijminê me xwedî qad û mal

Setemkare carek xwedî mal û gund  
Çi kurd û çi turk û çi japon û hind

Tenê em di ïro divêr serxwebûn  
Me tiştek çunîne, dixwazin hebûn

Nebî ko tu dîsa bibî wek terî  
Li pey êl û olan tu wek ga herî

Digel serxwebûnê divê wekhevî  
Welat û dirav û zevî ên tevî

Di kar û xebatê niye hevrikî  
Çi karî dikarî bikî ba bikî

Li gora xebata xwe karî bibî  
Eger ko nexweş bî dibî her dibî

Nebin olperest û nebin êlperest  
Bi pêşve herin em bi tektîk û rest

Ne kolê bega bin, ne derwêş û dîn  
Dilê xo bison em ji gir û ji kîn

Bi xwendin û dezge dibin em mirov  
Eger ev nebin em wekî hirç û hov

Derê xwendegahan li herder vebin  
Ji her nifşî zarok hemî têde bin

Firokan bi jorxin Zerî û Perî  
Tirên û gerok da biçin herderî

Derêxin ker û ga ji bin bar û dar  
Pezê xwe xwedîkin li her cî û war

Derekotor li her cî bikî qîre-qîr  
Di nav herdû perçan nehêlin gizîr

Ber û lat û hîman bimalin ji rê  
Bi xore bilîzin li herder çirê

Hinermend û zana gelek peydekin  
Ko atom û sîsik ji hev perçekin

Bi wê em herin jorê çerxa felek  
Di pingav û derya gemî û kelek  
  
Riyên şos û hasin gelek çêbikin  
Li her cî serayên bilind lêbikin  
  
Şevê bikne ronî wekî roj û tav  
Ji her kesre kar û zevî û dirav  
  
Ne sînor bimênin, nejî paseport  
Tu serbest bi hevre herin qîz û xort  
  
Ne sawîr û tirs û ne xewn û derew  
Ji dijminre dîsa nebin çêlekew  
  
Bi destê xwe bigre tu ferman û dar  
Welatê xwe pêşve bibe hoşîyar  
  
Derê vê niviştê tu carek veke  
Tu rewşa me îro ji bîra meke  
  
Eger baş te dîtin bibê aferîn  
Eger tiştekî kêm heye jê derîn  
  
Tu ristan bixwîne belam kûr binêr  
Li îro û hêtê gelek dûr binêr  
  
Ji bo we dibêjim ku ez pîr û kal  
Zikê min li ser we diêşî heval  
  
Dibêjim ko rojek nebêñ kes nebû  
Weyan kurd di her demde bê kohne bû  
  
Ne peyxamberim lê bi tora û rist  
Li ser min dibêjin hezar kurt û pist

Me guh girtî navêm bicarek vekim  
Ku dengê negengan bicarek nekim

Ji rê ger li hindamekê derketim  
Bizane di kurve herim wek şetim

Bi pesnan kesek nabî wek Efletûn  
Di ser hevre tê û diçî ev hebûn

Çi pesnê mezin ez ji bo xwe bikim  
Di jînêde zanim ku ez hevrikim

Negencî û qencî bi destê mene  
Ku herdû di laşê yekîde hene

Wekî serm û germ û hebûn û mirin  
Wekî çandinî û wekî hilkirin

Di avêde rûnî divê şil bibî  
Tu destan li tûjik bidî kul dibî

Bira guh mede gotinên pir nebaş  
Hinek pir li pêşin, hinek pir li paş

Tenê zû li ber herkesî tif meke  
Li dengê hevalên xwe herdem seke

Çi bêjî, tu jêre bibêje belê  
Di devde mebêje tu pirsên kelê

Ji her tiştê başre dilê xo veke  
Heçî ko nebaşe tu dûrî xwe ke

Li hinda hevalan meke kurte pist  
Ji wanre bibêje tu rast û dirist

Şiyarke tu cotar û karker û jin  
Dibin tîpeki pir giran û mezin  
Li van herçî 'o ew welatperwere  
Li pey wan heçî ko bibêjî bere

## DEZGE Ú DEZGEVANÍ

Bibe dezgevanek bilind ú mezin  
Tu dezge bixwêne, çi mîr ú çi jin  
Tu hasin verêse bike tang ú top  
Li pey xwe bihêle tu xweş rêç ú şop  
Gerok ú firokan tu jê çêke xweş  
Di rêve bere kes neçî qet bi mes  
Li bala herin em wekî dêw ú cin  
Bi hevre xweş ú bêş herin mîr ú jin  
Bi zanîn ú xwendin bidin pêş hiner  
Bere xweş bijîn qasekî ga ú ker  
Welatê ko dezge bi pêşde nebî  
Ewê tim di destê neyarande bî  
Çine xişt ú tizbî, tu hasingerî  
Ji bo miletê kurd tu xweş rêberî  
Ji her nivşî xwendin ji bo me divê  
Ko em xweş bikin qad ú geşkin şevê  
Ko hasin nekin em ji alavê cot  
Li ser palevînka nekin qote-got  
Me abor ú dewlet dimênin li paş  
Di bin barê dijmin bizar didne kaş  
Ko hasin li nik me gelek pêşve çû  
Mirovên nexwendî diçin pêşve zû

Bere xanîyan em bi wî lêbikin  
Pir û kanîyan em bi wî çâbikin  
Dirêjkin şivên hasinî ser riyan  
Tirêñ bê û qêrîn bidî ser çiyan  
  
Li herder dixan xweş bilind bî li jor  
Ji xo em derênin bi xurtî û zor  
  
Çi tiştên di nav van çiyande heye  
Eger dernexin tev ziyana meye  
  
Ko xwenda û zana û hosta hebin  
Heçî ko veşartî ewê ser vebin  
  
Ji bo me verêsin bikin xurde caw  
Heta ko bibin em mirovên bi saw  
  
Welatê xwe carek bi wan xweş bikin  
Bi şahî û cejnan xwe rûgeş bikin  
  
Bi zanîn û xwendin sivik herne pêş  
Bi top û bi tang û bi tektîk û gêş  
  
Bixwêne, bibe hoste û dezgevan  
Çiman dê li ber pez bibin win şivan  
  
Divê em xwedîkin hemî reng sewal  
Tijîkin ji zêr û diravan çewal  
  
Çi tiştên ku derxin ji qada welêt  
Dibî sermiyan û bikêrî me dêt  
  
Hemî nifşê dezge divêñ ko hebin  
Ji miletre çêkin, bi destê me bin

Ne ên yek mirov bin, ne ên çend mirov  
Mirovên çikûş û setemkar û hov

Ji her kesre kar û ji her kesre kar  
Ji karker û xwendare hevsar û dar

Bi hevre bijîn serbilind mîr û jin  
Peyayêñ bilind û mirovên mezin

Ku destûr û rist bûn mirovperwerî  
Hesanî dibin rêberî, serwerî

Eger hasinê xurt bi destêñ me bî  
Li her der ewê rûmeta kurd hebî

Bi hasinkelandin, bi hasinkerî  
Welatê me pêşve diçî namirî

Belam ger hemî kurd bi destûr û bend  
Bi hevre civatêñ xwe çêkin lewend

Dilê Somer û Sobera xweş dîkin  
Bi hasin dikarin me rûgeş bikin

Ne tim hasinêñ xurt ji bona şerin  
Bi hasin dikarin bi pêşve herin

Belam şer hebî pê ji xwe dûr bikin  
Cihê hov û şerxwaz gelek kûr bikin

Ji bo ko welatê xwe pê bidne pêş  
Nemênin di navde, ne zor û ne êş

Ji hasinre milxwar û piştixûz bibin  
Bi çakûç û mîkut bi serkûz bibin

Bi wî em mirovan serefraz bikin  
Welatê xwe jî pê xweş û saz bikin

Derekotor û patoz, firok û gemî  
Li qad û di avê li kar bin hemî

Bi wan em bikin geşt û seyran û ger  
Hejarî, nexosî, herin bêveger

Li jor van çemên pir mezin bikne gol  
Bi wan xweş bikin em çiya, deşt û çol

Ebor pêşve bajon bi gavêñ dirêj  
Çine bang û rojî, zekat û nimêj ?

Ne derwêş û dînin, ne hov û ne hirç  
Ne ew kurdê kevnê ser û sîng bi pirç

Nema şêx û axa bi me karibin  
Meger wan bi salan jî em xwaribin

Bi hasin bihêrin serê wan diza  
Bibin serbilind em, bibin ew weza

Ji nûve nema karibin wek berê  
Me lokan girêdin bi dûvê kerê

## KARKER Û COTAR

Bi destê te pale, cihan xweş dibî  
Nezanî ko bextê te wer reş dibî

Bi roj û bi şev her li bajar û gund  
Li serhev dikî xan û qatêن bilind

Tu hasin dikî top û tang û tiving  
Di ber dijminande dikî qîr û deng

Firok û gerokên xweş û pehlewan  
Bi hêzê milêن xwe tu têنî cihan

Xwedî semiyan vê gemarê dibin  
Di rojêde dehyek bi dest nakevin

Tu kara xwe ya pir dixî dest ewan  
Bi zor derdixî roj bi roj kinc û nan

Bi piştä xwe ya xûz û destêن gemar  
Xebata xwe erzan didî dest neyar

Çi gernas û mérî, çi dêwê xebat  
Ji bo dijminaye hemî kêferat

Tu Eywanê Kesra mezin çêdikî  
Pir û qat û xanêن bilind lêdikî

Tuwî dawerê wan kelat û sera  
Li pêşî mirovan tu bûyî çira

Tu çêkrox û lêkrox û xweş dawerî  
Tu dêwê xebatêye xweş karkerî

Dikî û didî lê tu birçî û jar  
Ne jendî, ne xwendî bi destê neyar  
Tu xav û ne ristî, bi sistî diçî  
Di karêñ dizande tu rû qemîçî  
Tu piştxûz û milxwar û ser tim di ber  
Bi xore şev ro dikî ceng û şer  
Çi xurtî ? çi dêwî ? çi milhasinî ?  
Çi kohê bilindî wekî dasinî ?  
Tu Zagros û Cûdî, bilind û sitûr  
Ku ev çende daxwaz ji te kûr û dûr  
Ji xew rabe carek şiyarbe tu zû  
Di jînê tu xwes zanibe arezû  
Bizane seranser cihana teye  
Eger ranebî tev ziyana teye  
Divâm hilgirî çek wekî pehlewan  
Bi destê xwe bigrî seranser cihan  
Li darxî tu rista xwe ya wekhevi  
Bibî wek bihiştê li her der zevî

## COTKAR

Tu cotkarê kîye? çiye cotkirin ?

Ji dijminre kar û ji bo we mirin

Verakir seranser we çol û beyar

Tu rencê dikêşî ji bona neyar

Dixwî nan û nîsk û girara rijî

Hezar sale bindestê dijmin dijî

Digel zar û zêçan di koxên kera

Li gundan dimenin wekî rencbera

Tu karê beg û şêx û axa dikî

Ji wanre li şax û li baxan dikî

Diçenî, çinîn û hilanîn li te

Dikoli û çandin û danîn li te

Diçerênî, dotin, kelandin li te

Meyandin, keyandin qelandin li te

Ji bo te dimenî dewê tevde av

Ji dijminre karê te zêr û dirav

Dijî wek sewalan di koxên kevin

Tijî mar û mişkin, bi kevn û tevin

Di laşê wede cîgire penceşêr

Nezanî, didî dijminan xêr û bêr

Dixwazim şiyarbin ji xew carekê

Li hev kom bibin win di êvarekê

Bi pala û zanave tev bibne yek  
Bi dar û bi top û tiving û bi çek  
Herin ber derê dijminan wek gura  
Dikarin bi hevre bijîn wek bira  
Li xo parvekin qad û av û zevî  
Hemî kes bi şadî li ser rakevî  
Bixun, hem vexun win xwedî zêr û mal  
Bi hevre herin cot bira û heval  
Tu xweşke welatê xwe rengê bihişt  
Jin û mîr bibin wek perî û firişt  
Rez û bax û werzan li her der biçîn  
Bibin şax û deştên me tev kesk û şîn  
Perî şad û geş bin digel sorgulan  
Zerî bêñ temaşa gul û sinbilan  
Vekin em li herder çem û çâ û çok  
Gulên pembiwêñ me bibin wek gilok  
Li her der biçenin hemî nifşe dar  
Zivistan li me tim bibî wek bihar  
Bikin tev bi hevre jin û mîr xebat  
Bi pêşve bibin em hemî rojhilate  
Bira, dest bidin karker û xwendewar  
Jin û mîr bi hevre bixin dest xwe dar  
Ji xwe dûr bikin win çi tiştên derew  
Ji dijminre dîsa mebin çelekew

Di xanêñ bilind û mezinde bijî  
Heta ko bi ya min nekî napijî

Ji sawîr û tirsê xwe paqijke bes  
Tu tifke riwêñ van mirovêñ teres

Riyan çêke carek bi hasin û zift  
Gerok û tirêñ bêñ bikin kefteleft

Li jorêñ çeman çêke pingav û gol  
Bi wan xweş bike van çiya, deşt û çol

Bere kes nemêñî weza û reben  
Bi hevre bijîn tev bi şadî û ken

Li her der şevê xweş bikî kareva  
Herin kar bi rojê, vejênin şeva

Bi dans û bi dîlan û govend û ger  
Jin û mîr bi hevre bijîn ser bi ser

Ku çakûç û das û tiving û qelem  
Li nik me bi rûmet bibin dem bi dem

Di rojêñ şera rengê şêr û piling  
Digel dijmin û xwînmijan bikne ceng

Heçî şer bixwazî wî winda bikin  
Şerê mîrkuj û bûm û kunda bikin

Ne şêx û mela û ne axa û beg  
Nemêñin mirovêñ neyar û dizek

Ku rista welatê me bû wekhevî  
Hemî kes xwedî mal û zêr û zevî

Ko qata bilind çû dibin tev bira  
Evîna welatê me xweş bit çira  
  
Ku hevsarê rêzanîya qêş û gel  
Nedin dest mirovên neyar û zexel  
  
Ji xwe hin mirovên hinermend û jîr  
Veşenin civatê serok û wezîr  
  
Li wan tevde guhdar û çavnêrî bin  
Di virde jinêñ çê wekî mîrî bin  
  
Ne tizbî û xişt û ne rî û ne şas  
Tu tifke riwê wan mirovên nebaş

## JİN Û MÊR BÎ HEVRE DÎ NAV KARDE

Jin û mîr bi hevre di nav karde bin  
Derê dewlemendî li me dê vebin  
  
Derekotor li qadê tu xweş kar bikî  
Bi cotê ker û coneşa dê çikî  
  
Bi wîre tu carek bibe dost û yar  
Bi wî rake qada xwe çol û beyar  
  
Bi hasin biçêne welatê xwe tev  
Li ser hev tu bajo bi roj û bi şev  
  
Bi patozê paley bike ey heval  
Çewalan bi kenyonê bikşêne mal  
  
Çi das û çi qeynax û tar û tixar  
Li ber karê nûjen çine kevnekar ?  
  
Qerêja hezar sal û kevnepêrist  
Di iro ji bo me meke mal û rist  
  
Hezar sale ko em bi tirs û bi saw  
Li xwe me dipêçan hemî çerm û caw  
  
Beg û şêx û axa nehişt herne pêş  
Tevan em dimêtin wekî kêç û mês  
  
Dixistin serê me çi tiştên kelê  
Tu iro bixwêne û xweş tifke lê  
  
Ji axa û şêxanre bes kar bike  
Bixwêne ji xew zû xwe hişyar bike

Çiman rûdinin ew di xanêñ bilind  
Nikarî tu nanê xwe derxî li gund  
Ji mal û bi destê tene ev sera  
Ji vê rê vegez zû, şiyarbin, bira  
Beg û şêx û axa mebêne mezin  
Hemî lewçe û tev neyar û dizin  
Nezanî reşandin li her cî bi tov  
Bi xwe ew şiyarbûn tu ma hirç û hov  
Heta rêberê me Elo bit bira  
Divê xwarina me çilo bî, çira  
Bi dilpaqijî em milan nedne hev  
Şerê dijminê xwe nekin roj û şev  
Ji derive me dijmin bi saw û bi tirs  
Ko xwînxwarê turk û setemkarê firs  
Di hindirde axa û paşa û şêx  
Bi darê xwe bigre giha kê, tu lêx  
Qerêja xwe paqij bike ey geda  
Li pey xwe tu qet sinbila bermeda

## REWŞA KURDİSTAN

Li rewşa xwe meyza bikin, xwendewar  
Ne qade, ne ave, ne zêre, ne war  
  
Ne rûmet ji bo me heye, ey heval  
Bi dîlî me derbaskirin mah û sal  
  
Di bin dar û qamçî, bi zindan û êş  
Ku rewşa me gavek xweşik nare pêş  
  
Nexwendî, nezan û reben, sade dil  
Di bin dar û zorê dijîn dil bi kul  
  
Mebêje ko çendek hene dewlemend  
Xwedî mal û zêrin li bajar û gund  
  
Ji ber ko ne kurdin, dizê malê kurd  
Li kalik bipirse dibêni zigurd  
  
Bi dijminre tevde xwedî par û pişk  
Ji bona me dew ma, ji wanre nivişk  
  
Hemî gundi û karker û palevan  
Perîşan û sêfil, hejar û nezan  
  
Didan van dizan wan hemî qad û rez  
Bi gorî serê wan dikir dexl û pez  
  
Hemî bûne şêx û beg û xanedan  
Evêñ dî, hemî em weza û nezan  
  
Nezan bûn me destê ewan maç dikir  
Hemî qad û dewlet ewan bo xwe bir

Ji ber ko milet tev xezan û nezan  
Me malê xwe xiste devê van dizan  
  
Çi rewşek perişane em tê dijîn  
Xem û derd û dîlî li ser me rijîn  
  
Di bin destê dijmin dijîn rengê hov  
Nizanim ko kengî dibin wek mirov ?  
  
Hemî kes bi gavêñ mezin pêşve çûn  
Bi xwe xweş kirin wan hemî jîn û şûn  
  
Xwedî dewlet û leşker û tang û top  
Li pey xwe dihêlin çi xweş rêç û şop  
  
Li her der ku avakirin xwendegah  
Di wande dixwênin biçûk sal û mah  
  
Bi her nifşekî xwendinê hîn dibin  
Tenê em bi ola xwedê dîn dibin  
  
Nizanîn bixwênin, ziman çewt û xwar  
Bi vî rengî borîn ji salan hezar  
  
Mirovê nexwendî çi zanî bikî ?  
Tenê ew dizanî gir û hevrikî  
  
Ziman û welat û milet perçe bûn  
Ji dijminre hiştin me mal û hebûn  
  
Çiqas xew giranî, çiqas radizî ?  
Heta ko dizan mal û dewlet dizî  
  
Ne şerme welatê te wer perçe bî  
Kirasê hejarî li bejna te bî

Di bin destê dijmin weza û reben  
Bi tirs û bi sawîr li ber dar û ben  
  
Weha têne kuştin bi destê neyar  
Ne rûmet, ne dewlet, perişan û jar  
  
Kerê dijmin û rencberê şêx û beg  
Şiyarbûn û karbûn ji bo te gerek  
  
Serî hilde carek bibe pir şiyar  
Welatê xwe derxe ji destê neyar  
  
Tu bê rewş û pergal û kodik bi dest  
Perîşan û dîlî, reben, jar û mest  
  
Eger wer bimênî reben, bendewar  
Di bin destê dijminde dîl û hejar  
  
Riya te sivik ber bi êvar diçî  
Ne bes paşdemayî, tu yekcar diçî ?  
  
Li te bûye payîz û zer bûne pel  
Bi ser wande ba tê zivistan digel  
  
Ditirsin tu winda bibî wek kuli  
Çi kara me têde heye ev gili ?  
  
Bi rextan xwe rapêçe ey xortê kurd  
Bibe Erdeşerek ne wek Yezdîgurd  
  
Xebatê bikin em hemî roj û şev  
Bi leklek herin ser neyarên xwe tev  
  
Welatê xwe bigrin ji destê neyar  
Bibin em xwedî dewlet û namîdar

Bi rûmet bijîn em wekî her kesî

Ji bona me destûr bibî Markisi

Welatê me xweşbî bibî wek bihişt

Ji miletre dewan bibî bav û pişt

Bi hevre bijîn em hemî serbilind

Bi şadî û xoşî, li bajar û gund

Hemî rewş û pergel tim li me xweş bibin

Riwê herkesî dê bi me geş bibin

Ne şerme ku rewş û pergal û jîn

Hemî paşketîbin, di bin êl û dîn

Mirîşo bibin rêberê kurd û Mad

Bikin şêx û axa li ser xwe Qubad

Were em bi hevre bibin wek bira

Welatê xwe derxin ji destê gura

Li ser vê sitêrê bibin payedar

Hinermend û zana û jîr û şiyar

## ÊLPERESTÎ

Mebe êlperest ey kurê xwendewar  
Hemî kurd yekin ey keça namîdar  
  
Bicarek li axan tu bawer mebe  
Li hinda birayên xwe gawir mebe  
  
Ji bo ko mezinbî mirovek nebaş  
Dubendî welatê me hiştin li paş  
  
Dema êl û bavik nema ey heval  
Di serve bihirtin gelek çax û sal  
  
Rizîne, genîne, mebe êlperest  
Ku dijmin ji bavê me ev reng dixwest  
  
Bi hevre me kurdan dikir berberî  
Hezar perçe bûn, nebûn yek kerî  
  
Me hevdî dikuşt û me hev kêm dikir  
Gurê dijminan me li xwe êm dikir  
  
Di bin destê dijmin dibûn ker-kerî  
Pezê bê şivan û lekên bê serî  
  
Me êrîş dikir hev wekî şêr û gur  
Heta roviyê reş penîrê me bir  
  
Ji alîkî şêx û melayên nezan  
Ji alîkî axa û paşên dizan  
  
Ji me bîr û bawer bicarek dizîn  
Heta ko dibin destê dijmin rizîn

Begê pir nebaş û gurê gornepaş  
Di bin destê dijminde hiştin li paş  
Çi Xerza û Bota û Zaza û Tor  
Çi Kurmanc û Kelhor, ci Goran û Lor  
Hemî qey ne kurdin çima perçe bûn ?  
Bi destê neyararne berdan hebûn  
Ji banîve hîmek dema tête xwar  
Ji ber wî ditirsin hemî canewar  
Bi him-him diçî jêr û şopek mezin  
Li pey xwe dihêlî kelax û mirin  
Belam ko li jorê çiyê perçe bî  
Tu bawer meke ko wî tînek hebî  
Bi hevre, li pey hev hemî rêz dibin  
Ji vê perçebûnê ci bêhêz dibin ?  
Nikarin bi jêrde sivik dakevin  
Di kortan û erxande wê rakevin  
Weharenge milet dêma yek dibî  
Gelek mîr û gernas û pir şek dibî  
Di tarîxê şopa xwe xweş çêdikî  
Çi destê dirêj bî welêt jêdikî  
Belam ko ji hev perçe bû jar dibî  
Dibin destê dijminde binbar dibî  
Li her gundekî yek dibî padîşah  
Ne top û ne leşkerin, ne pişt û penah

Di bin destê dijmin wekî rencbere  
Çiqas bargiran bî nizanî, kere

Bicarek xurêlin di qada beyar  
Hemî têne kuştin bi destê neyar

Peyayê neyaran keyayê mene  
Çi şerme kelah û çiyayê mene

Mirovên çiyayî çi gernas û mîr  
Di rojêñ şerande wekî hirç û şîr

Dizanim tu gernasî ey şêrê kurd  
Di bin dar û zorêde mayî zigurd

Tu lokî di bin barê şêx û began  
Tu dan ber piyêñ va neyar û segan

Dikojin wekî seg heta hestîya  
Di bin barê dijmin gelek westîya

Di bin barê şêx û beg û kerdiza  
Perîşan û sêfil, hejar û weza

Binêre ku ev şêx û paşa û beg  
Li ber destê dijmin dijîn rengê seg

Li ber me meger xwe dîkin Keyqubad  
Di zindanê dijmin dîkin ah û dad

Bi fortan li nav gundîyan û jinan  
Xwe paye dîkin lê kerê dijminan

Li ser me dibin beg bi qamçî û dar  
Dibin rencberê serdehanê neyar

Çilo win dibêjin "Belê ez xulam"  
Wilo ew dibêjin li nik qaymegam  
  
Xulamê neyare, begê ser meye  
Hezar sale rewşa me kurdan weye  
  
Bese zû şiyarbe tu guh med began  
Metirse ji dengê teba û segan.  
  
Tu destê neyaran çira maç dikî ?  
Ne dînî ji bo çi xwe wer şas dikî ?  
  
Tu dûrbe ji bavik, mebe olperest  
Di kar û xebata xwede xwar û mest  
  
Bibin yek bizanin hemî kurd yekin  
Çiman em di vê rê wesan gewşekin ?  
  
Di bin navê wide bijîn em hemî  
Bicarek nehêlin ku bişkê gemî  
  
Bijîn ta bi kengî bi bindestî em  
Di bin destê dijmin bi nalîn û xem  
  
Bese zû şiyarbin hemî mîr û jin  
Di roja felatê bikin em cejin  
  
Mebêje di îro kemasî hene  
Gelek bend û partî siyasî hene  
  
Meger raste îro heye berberî  
Bi bîr û bi awir dibin çend kerî  
  
Nikarin bibin yek nizanim çikin  
Belam em ji bo te hemî kar dikan

Heçî ko li jêrin divên wekhevî  
Li her kes belavkin hebûn û zevî  
  
Ji dil tev dixwazin bibin serfiraz  
Welatê xwe bigrin, bibin karesaz  
  
Bi xurtî bi pêşve diçin rengê şêr  
Di ceng û şerande dibin xurtemêr  
  
Hemî bend û partî dixwazin welat  
Li gor ko dixwazin divên ew felat  
  
Dixwazin ben û dar di dest wande bin  
Li ser me weko bav û kalan bibin  
  
Bi olan, bi êlan me perça bikin  
Me wek hov û dîna û hirça bikin  
  
Dixwazin me bigrin bi vê davikê  
Bixin nêv çiravê heta navikê  
  
Nexwendî bimênin, nebin em şiyar  
Bi xapan me têxin di bin nîr û bar  
  
Ji nûve biçûkan bişîn xwendinê  
Ewê me xelaskin bi tolsendinê  
  
Mebêje ji rastim weyaxud ji çep  
Tu gawir mebîne kesek bê sebeb  
  
Birayên hevin em hemî jar û kurd  
Dibin destê dijmin dibin dar û gurd  
  
Bi hevre weki şêr hemî şer bikin  
Li meydanê wek şêr û ejder bikin

Tu zendan bimale kurê Erdeşêr  
Li Zagrosê Kohreş bibin xurtemêr  
  
Şerê dijminê hov û xwînxwer bikin  
Bi xurtî, bi kurdî timî şer bikin  
  
Xwe mespêre dijmin hevalê delal  
Heçî ko wekî me hejarin heval  
  
Ji wan pir metirse belam zane be  
Bi kurtî, li herkes tu bawer mebe  
  
Tu bistêne herdem, mède herkesî  
Bi ken be,mebe wek gula çilmisi  
  
Tu pirsên xwe bikşîn û qenc lê venêr  
Di rojêن xebatê mebe qelsemêr  
  
Li paş rameweste, tu tim pêşde her  
Bike serbilindî bi dijminre şer

## OLPERESTÎ

Mebe olperest ey hevalê delal  
Bi her kesre rast û diristbe heval  
Çi tiştên derew bin tu dûrî here  
Were em bi hevre herin pêş, were !  
Çi tiştê neqenc bî şerê wî bike  
Heçî qence herdem tu her wî bike  
Nebe dostê xwar û peyayê neyar  
Timî dost û yar be ji bo ê hejar  
Welatê xwe bigre tu hişyar û mest  
Bi qencare çêkin ci tiştên we xwest  
Di wê çaxê em tev dibin payedar  
Hevalê heval û neyarê neyar  
Ji herkesre peyde bikin kar û iş  
Mehêlin ku milet bibî bend û tîş  
Şerê êş û derdan bikin em ji dil  
Bi pêşde herin em hemû mil bi mil  
Reşê dûr bikin em ji qada xwe tev  
Wekî hev bikin em ci roj û ci şev  
Di gorêde razin ci zor û setem  
Bi hevre bijîn xweş hemî dem bi dem  
Ne birçî bimênin, ne jar û reben  
Bi şadî û rûgeş bijîn rû bi ken

Li cotar zevî bête tev parkirin  
Keç û xort bi dil bêñ li hev markirin  
  
Bibin em wekî hev çi jin û çi mîr  
Bibin malê milet hemî qad û zêr  
  
Bidin herkesî em belaş av û nan  
Bi rûmet bijîn em hemî palevan  
  
Ku derman belaş bî û xwendin belaş  
Ji nav xwe rihakin heçî pîs û şas  
  
Dizî ko nemêni, nebin hîlebaz  
Ji destê kesî em nekin gaze-gaz  
  
Eve olperestî, ne tirs û derew  
Ji dijminre em tim bibin çêlekew  
  
Heçî ko şerê me dikî gawire  
Cihê wî ku serbest bibin agire  
  
Heçî tiştê pake di her ol û dîn  
Bihûne, birêse, ji bo me werîn  
  
Heçî ko nebaşê bere hey herî  
Ji bona kerê reş xwe nakin terî  
  
Bi laşê me digrin wekî qijn û gen  
Hezar sale ko em hejar û reben  
  
Bizan ko ne bes ole tizbî û xişt  
Dibin barê şêxande milet bîrişt  
  
Eger ko xwedê wê li herder hebî  
Çima wê di kurdde, di kerde nebî

Eger qenciyê em bikin ew dikî  
Çima ko neqencî bikin ew nekî ?

Eger müçeyê herkesî ew didî  
Ji wî tim bixwaze ji bo çi fedî ?

Çima hin şehînşah bî hin jî geda  
Me navê eger ko wesa bit xweda

Çi işê me jêye, heye yan niye  
Eger ko nebânin ci zanin çiye ?

Bi xore divê şer bikin roj û şev  
Heçî têde peyda dibî bidne hev

Ji qadê derênin heçî baş û qenc  
Çi rezbî ci werzbî, ci dexl û birenc

Çi hasin û zêrbin, ci petrol û av  
Çiman em ji Alo bikin gaz û lav ?

Mirov çûne heyvê, divêne herne jor  
Niha jî nizanin çiye keskesor ?

Dibêjin li ezmanê heftan xwedê  
Kîye ew, çiye ew, gelek guh medê

Eger raste ew jî xwedî leşkere  
Here jêre bêje tu rabe şere ?

Bi êrîş gihane welatê te hov  
Dixwazin welatê te bigrin mirov

Ji destê te bigrin sitêran bi zor  
Bi sarûx û atom xwe hildane jor

Bere ew jî rabî bi top û tiving  
Berê xwe bidî me bi halan û ceng

Eger ew jî kurde wekî me reben  
Bi dest wî nemabî bihayê kefen

Ji meydan bi rev bazdî, dijmin li pey  
Bigorin li pey wî bi halan û hey

Welatê wî bigrin ji hev perçekin  
Hevalâñ wî bigrîn tenê dey nekin

Dimêñê perişan û jar û zigurd  
Wekî min, wekî te, dibî qelse kurd

Mihemed çilo çûye ezman bi ker ?  
Li kû rêx dikir wî kerê guh çeper

Neraste bira, carekê guh medê  
Mihemed jî zanî çunîne xwedê

Belam xwestîye dewletek çêbikî  
Kela dewleta xwe bi wî lêbikî

Ne peyxambere lê şehînsah û mîr  
Ji bo bendewarêñ xwe ew destegîr

Ereb ko di bin destê Roman û Kurd  
Hejar û nezan û geda û zigurd

Hezar perçe bûn ew bi hevre neyar  
Mihemed ku rabû hemî bûn şiyar

Bi zanîn û jîrî hemî kirne yek  
Wekî hev kirin wî çi serwan û beg

Kişandin serê xwe wî tac û kulah  
Hicaz xiste destê xwe bû padîşah  
  
Ku dî rom û kurdan dikin ceng û şer  
Li piştâ xwe bestane şûr û kemer  
  
Li hev kom kirin wî siwarên ereb  
Ku rimbaz û gernas dihatin celeb  
  
Wî koça xwe barkir, revand ew mirin  
Ebûbekre ê ko li pey rakirin  
  
Wî leşker kişiandin li Şam û Iraq  
Ji destê ereb rom û kurd faqe-faq  
  
Serê xwe wî danî li pey hat Umer  
Ku dijwar û cengawer û pir hiner  
  
Wî êriş li ser hev birin rom û kurd  
Ko Qeyser û Kesra wî xistin, zigurd  
  
Di dest wande şûr û bi dev wekhevî  
Ko şahê ecem zû şikest û revî  
  
Li Ehwaz û Helwan û hem Şehrezûr  
Li me şer giran bû bi gurz û bi şûr  
  
Bi zor em şikandin û talan kirin  
Jin û zar û zêçen me kurdan birin  
  
Xerasan û Faris, digel kurd û Cîl  
Ko Deylem bi wanre, hemî kirne dîl  
  
Hezar salî mabûn di bin destê kurd  
Niha bûne paşa li ser Yezdîgurd

Ku tac û kulahê Keyan dane ser  
Cihan tevde girtin bi halan û şer  
Umer hate kuştin bi dest deyлеми  
Bi ber pêl û çelqan ketî wan gemî  
Ku Osman li şûna Umer kirne şah  
Sivik da serê xwe wî tac û kulah  
Wî ola xwe berda û bû wek ziya  
Ku çavê xwe berdan Merwaniya  
Hemî kirne serdar û paşa û mîr  
Hinik jî kirin wî li nik xwe wezîr  
Eli bû cihê êş û derd û xema  
Ji ber ko bi destê wî tiştek nema  
Ji nûve girêdan kemerbend û pişt  
Wî Osman bi destê Mihemedve kuşt  
Li pey wî Eli bû şeh û padîşah  
Belam wî nedanî serê xwe kulah  
Li Şamê Muawî xwe kir şah û mîr  
Di nav wande şer xwes kirin şûr û tîr  
Ji nav herdu tîpan cûdabûn gelek  
Ku leşker girêdan ewan lek bi lek  
Eli hete kuştin Miawî li Şam  
Bi xapan bi rîpan, berek birtye dam  
Wî Misir û Hicaz û Iraq û Yemen  
Bi zor xiste destê xwe, lê nû Hesen

Serê xwe rakir û bû padîşah  
Belam wî nedaye serê xwe kulah  
  
Bi jehrê mirandin di çaxê Yezîd  
Huseyn ser bilind kir û pir bûn murîd  
  
Vexwendin ewan Kerbela bêqidoş  
Li ser wî neyaran kirin ceng û coş  
  
Pelaxtin serê wî bi şûr û riman  
Kesî ko bikêr bêñ li pey wî neman  
  
Ku şamî ji wê rojê bûne ereb  
Erebperwerin ew ci rast û ci çep  
  
Belam kurd û faris û deylem û turk  
Hemî bûne dilbij ji bo tac û kurk  
  
Ku aliî mirovên Mihemed kirin  
Bi merwanîyanre gelek şer kirin  
  
Heta ko gihane sed û sîh û do  
Bi paşde şikestin ereb ro bi ro  
  
Ku gurdanê kurdan gelek şer kirin  
Heta ko ji nav xwe ereb der kirin  
  
Ebûmislimê kurdê pir navîdar  
Ji dest dijminê kurd wî derxistî dar  
  
Cihan wî seranser bi şûr xiste dest  
Belam tac û dewlet bi carek nexwest  
  
Wî anî ji Kûfa yekî pir nenas  
Dibêjin Sefahe ji mala Ebas

Li Kûfa wî danî û tac daye ser  
Pelaxtin serê şahê Merwanê ker

Li pey wî ku Mensûr ereb dane hev  
Li hawîr nêrî wî nedî kes bi dev

Ji bil kurdê nazan û serhişk û hov  
Li ber xwe ewî kes nedî wek mirov

Bi bêbextî carek li Eywanê kuşt  
Ji bona me kurdan wî rûmet nehişt

Şerên pir giran zû ketin nav welêt  
Bi carek şewat û hemî ar û pêt

Li Mûsil, li Erbîl, li her cî û der  
Di nav kurd û dijminde bû ceng û şer

Bi vî rengî mane heta Deylemî  
Ji destê neyaran deranîn gemî

Çi kurd û çi firs û çi tirk û ecem  
Bi destê xwe girtin bi zor û setem

Ereb perçe, perçe kirin jar û dîl  
Meger kurd û turkan, meger firs û cîl

Me çandan şikandin bi şûr û bi rim  
Bi xapan dihatin welatê me tim

Li ser me bi xapan biwîn şah û mîr  
Bi ola xwe em tev kirin destegîr

Bi navê Ebas û bi navê Eli  
Ji me tev sitandin kelat û gelî

Bi ola xwe em kirne jar û reben  
Bi dest me nehiştin bihayê kefen

Jin û mal û qada xwe tev dane wan  
Di laşê welatê me jana giran

Bi jarî û dîlî ketin dest diza  
Heta ko gihane Kemal û Riza

Meger ko ereb bûne bindest û jar  
Bi ola xwe dîsa li me bûn siwar

Zimanê xwe xistin cihê zarê kurd  
Çiqas ez bibêjim hemî jan û derd

Niha jî berî me ereb bûn şiyar  
Bi ol û zimanê xwe man payedar

Zimanê xwe carek me pêşde nebir  
Li ser xwe vejandin me Zeyd û Emîr

Hinek bûne şêx û hinek bûn mela  
Welatê me talankirin teşqela

Bi kurtî dibêjim belam pir dirêj  
Serê me şikandin bi rojî, nimêj

Bi bang û nimêj û bi tizbî û xişt  
Li me wan şikandin ser û dest û pişt

Bese zû şiyarbe ji vê rê vejer  
Gelek pîs û xware, tu bes pêde her

Tu ola xwe deyne welatperwerî  
Xwedî ristevan û xwedî rêberî

Bi ya min bike ger dixwazî bijî  
Bi pêşde herin em, ejî hem tijî  
Ji dijmin tu bistîne tim doz û tol  
Ji bona me ev dê bibin rist û ol  
Divê kurd û tazî û turk û ecem  
Di îro bi hevre bijîn dem bi dem  
Divê em di qadêñ xwede yek bi yek  
Bijîn em bi hevre hata bê demek  
Nivîsîn û xwendin bi zarê me bin  
Ku destûr û ferman û darê me bin  
Di qada xwede em bijîn serbilind  
Bi sînor û leşker, hemî pak û rind  
Heçî ko ne pake sivik pêvedin  
Heçî tiştê pakin ji dest bernedin  
Ne şêx û mela û ne axa û beg  
Di nav me nemênin gurên har û seg  
Bibin wek bira û mirovperwerî  
Mirovên cihanê bibin yek kerî  
Li ser vê sitêrê bi halan û deng  
Bicarek nehêlin, ne talan, ne ceng  
Ji qadê derênin çi tiştêñ bi kar  
Nemênin li ser vê sitêrê hejar  
Bi êrîş herin van sitêrêñ bilind  
Ku ava bikin em li wan şar û gund

Çi tiştên bihane ji wan bêne der  
Wekî hev bijîn em hemî ser bi ser  
  
Di gorêde razin çi zor û setem  
Li ser me nebin şah, ne turk û ecem  
  
Belam zanibe ko bi xurtî û zor  
Hemî tişt dixwazin herin ber bi jor  
  
Li sinbil binêre eger çûyî gund  
Heçî xurte her dem dibî serbilind  
  
Di rewşa cihanê çi mîr û çi jin  
Heçî têde xurtî heye, ew mezin  
  
Ewê ko ne xurte hejar û weza  
Perîşan dimêni bi destê diza  
  
Eger wer bimêni bi nalîn û ax  
Dibin lingê tangan dimênin kelax  
  
Serê xwe tu deynî li ber pencê şêr  
Xelas nabî carek bi mizgeft û dêr  
  
Divê jîr û zana û pir kone bî  
Ji alîkî xencer bi destê te bî  
  
Bi merdî şerê dijminê xwe bikî  
Ne wek par û pêrar û wek do bikî  
  
Xwe mespêre ola neyaran ji dil  
Li dehma hemî dijminan dil bi kul  
  
Eger ko bi dijmin tu bawer bikî  
Di vê rêde carek xwe gawir dikî

Perîşan û bindest û bêol û jar  
Serê xwe te danîbû ber pê neyar

Ji hîmek reşikre te ser xwar dikir  
Bi vî rengî her dem xwe binbar dikir

Ne xwendin, ne nosîn, ne zar û ziman  
Di bin destê dijmin hezar salî man

Bi xişt û bi tizbî tu mayî li paş  
Ne aşê te bû lê tu bûyî qeraş

Tu lokek mezin bû, ne berdayî bû  
Te hevsar bi kerve girêdayî bû

Bi hawar û qêrîn dikim arezû  
Kevir min çirandin, şiyar nabî zû

Çi dêwek bilindî serî pir mezin  
Li qada te dijmin çilo radizin ?

Ji te herkesek dil bi tirs û bi saw  
Li nik dijminan ling dibend û giraw

Bi navê te çîrok digotin bi dev  
Ji tirsa te xew nedikirin roj û şev

Hemî şar û bazar û eywan û gund  
Welatê te bû ta bi Efxan û Hind

Ne şerme ku îro tu bindest û jar  
Perîşan û naçar û kolê neyar

Tu gernas û dêwî, kurê Mad û Hor  
Welatê xwe bistîn ji dijmin bi zor

Bibin dewlet û tim bi ferman û dar  
Bese rovîyê reş penîrê me xwar

Bi gurzan li te ez didim her demî  
Serê te çi hiske, wekî Rustemî

Ji xew rabe carek li min guh bidêr  
Bi hevre herin dijminan nêreşêr

Tu ev çende mîrî wekî pehlewan  
Ji derwêş û şêxanre bû dergevan

Li pey kes meçe ger divê serxwebûn  
Dema te gihaye divê bes dirûn

Ji qada xwe dijmin bi zor derxe zû  
Heçî ko neyarê te bî tifke rû

Tu dêwê çiyayê ser û sîng bi pirç  
Di bin destê dijmin wekî hov û hirç

Binêr xelk çilo çûne heyva bilind  
Nikarî tu mala xwe xweşkî li gund

Ewê ko firok û gerok çêkirin  
Xwedî rûmetin ew ji me çêtirin

Bi xwendin, bi jîrî gihan vê yekê  
Nikarî, nizanî herî rêyekê

## BİLİNDÎ DEWLEMENDÎ

Bira dewlemendî şirîn û xweşe

Tenê serbilindî gelek rûgeşe

Hemî kes dixwazin bibin dewlemend

Hemî kes dixwazin bibin serbilind

Riya dewlemendî ne pir paqije

Li her der girara wî xav û rije

Riya serbilindî tijî rûmete

Ewê serbilindbî xwedî dewlete

Bere dewlemendbî, belam payedar

Tu qada xwe mespêre destê neyar

Perên xwe birêje riya serxwebûn

Bizan serxwebûne ji bo me hebûn

Hebûna welatê te tev dewlete

Tu bistîne carek, pîrozbit li te

Tu malê xwe birjîn, bibe serbilind

Bi destê xwe bigre tu bajar û gund

Çiqas dewlemendbî ne malê teye

Ku dijmin seraser neyarê teye

Di bin destê dijmin perîşan û dîl

Tu tête pelaxtin di bin lingê fîl

Dikarî te talan bikî gavekê

Di binve li ber te vedî davekê

Te gerdenşikestî bihêlî, reben  
Bi dest te nehêlî bihayê kefen

Welatê te zindane pir teng û kûr  
Di navde dinalin, hemî kûre-kûr

Eger serbilindbî bi tang û bi top  
Li dijmin bigorî bikî qope-qop

Welat û felat û hebûn ên tene  
Heçî ko wî hiştin li şûn ên tene

Tu serbestbe carek di qada xwede  
Çi tiştê te girt wî werê, ber xwe de

Dikarî bibî dewlemendek mezin  
Xwedî mal û dexl û sewal û bizin

Bi malê xwe leşker bike xurtemêr  
Di rojên şerande bibin nêresêr

Tu hingî dikarî bibî dewlemend  
Di nava cihande bibî serbilen

Bibî dewlemend û bibî payedar  
Tu çavêن xwe meşkin, çiye ev gemar ?

Eger serbilindbî dibî dewlemend  
Dibî payedarek çeleng û lewend

Welatê xwe carek tu azad bike  
Jin û mîr û mîlet tu dilşad bike

Bere ew te rêkin, here berleman  
Bibe kurdekî xweş bi nav û nîşan

Mebe dewlemendek çikûs û pepûk  
Bere tif riwê te nekin tev biçûk  
  
Di rojnameyên kurd bibe namîdar  
Hemî kurd ji bo te bibin bendewar  
  
Serê me ji ber te bibî pir bilind  
Bibe rêberê kurd li Çin û li Hind  
  
Tif û zêr û malê li nik ê çikûs  
Ne rûmet heye wî, ne çehr û mikâs  
  
Dêma ew di rêve diçî ber bi jêr  
Ji hawîr dibarin li wî tif û çêr  
  
Mebe dewlemendek perîşan û jar  
Li ber destê dijmin mebe nobedar  
  
Tu rûmet biparêze ey xanedan  
Di vê rêde deyne tu ji mal û can  
  
Nebî ko bi malê xwe pir payebî  
Li ber dergehê dijminan kolebî  
  
Tu malê xwe deyne di rêça wêlat  
Dibin semiyanên te jîn û felat  
  
Bi kurdî tu bimre, bi kurdî bijî  
Tu malê xwe birjîn bi dilpaqijî  
  
Dibî serbilind û dibî dewlemend  
Li ber çavê milet şirîn û lewend  
  
Li ser te dibêjim ejî wê demê  
Dilê xwe bişam ez ji derd û xemê

Bihûnim li ser te hezar pend û rist  
Hemî pesn û şabaş û fortêñ dirist  
  
Bi xama xwe bigrim bibêjim gelek  
Bikim nav û dengêñ te bighêñ felek  
  
Li ser te biçênim gulêñ sor û zer  
Diran ez birêjim bi zêr û zeber  
  
Bi ya min bikî wer mebe malgenî  
Li hinda te rojek kesek nakenî  
  
Ne tif têñ riwê te, ne qerf û tinaz  
Eger wer çikûsbî çikin lav û gaz

## BIBIN MARKISI

Hevalê delal zû bibin markisi  
Bibêjin, bixwênin, bidin her kesî  
Xebatê bikin da bibin têr pere  
Were da bi hevre herin, ka were !  
  
Mebêje tenê kerdevarî bese  
Ewê ko li xêra meye Markise  
  
Bixwêne, bizane hela ka çiye ?  
Heçî tiştê gotî hemî qenciye  
  
Dibêjî:bibin yek hemî wek bira  
Li hev parvekin win zevî û pera  
  
Bi hevre xebat û bi hevre xelat  
Ji bo me tevan kar û mal û welat  
  
Di nav xwe mehêlin çi zor û setem  
Ji xwe dûr bikin tev kul û derd û xem  
  
Heçî dewlemedbin, hemî karbikin  
Hebûnê bi hevre li xwe parbikin  
  
Mehêlin kesek parsek û bêqeram  
Tu serbest here London û Misir û Şam  
  
Çine gumrik û deskere, paseport  
Bi serbest herin, bêñ hemî qîz û xort  
  
Bibin wek welatê te her qad û cî  
Bere kes nebêjî bi kûve diçî

Xebatker û karker bibin sermiyan  
Ji bo me tevabin çi kar û ziyan  
  
Belengaz nemênin hemî dewlemend  
Bi pêşve herin tev çi bajar û gund  
  
Ku destûr û rista me bû wekhevî  
Li cotar belavbûn xebat û zevî  
  
Welatê meyê xweş gelek xweş dibî  
Riwê herkesî dê bi wî ges dibî  
  
Mebêje ko kurdên te yek qatekin  
Dirî û hirî tev ji yek qatekin  
  
Bizane mirov tev du qatin bira  
Li gora zevî û li gora pera  
  
Xwedî zor û zêrbûn, xwedî gund û dar  
Hezar sale ko wan welatê me xwar  
  
Dibêjin ko qata bilindin li jor  
Divêñ ko li ser me bijîn ew bi zor  
  
Hevalêñ hevin tev li her cî û war  
Xwedî gund û zêrin, bi dest waye dar  
  
Di bin ware qatek heye tev reben  
Bi dest me nemaye ji bil dar û ben  
  
Li ser me xebat û ji bo waye kar  
Meger ew jî kurdin, hevalêñ neyar  
  
Dema xwarinê ew hevalê gurin  
Divêñ em ji wanre peran hilgirin

Divêñ em bikin lê tenê ew bixun  
Dizanin ku li ber wan em nakuxun  
Girêdayî pişta me qayış û ben  
Beg û mîr û sêxin, tenê em reben  
Ji wanre dikan em hemî kar û cot  
Heçî ko me da hev begê min firot  
Nimêjan dikan em reben, roj û şev  
Dikan pesn û fortê xwedê em bi dev  
Tenê şêx û seyda ji bona pera  
Dibin hemnişinê diz û zorkera  
Qerêja bi destêmeye tev dixun  
Berin em di lîzê tenê ew rexin  
Bi zor û bi xapan me talan dikan  
Li me rav û nêçîr û halan dikan  
Hemî jîr û zana, diz û bîrewer  
Bi hevre dilîzin li her cî û der  
Beg û şêx û axa meger hindikin  
Bi destê me tîran di me werdikin  
Seranser bi zanîn kirin em du bend  
Piyêñ me girêdan bi zencîr û bend  
Bi kuştin, bi talan, bi ceng û şewat  
Li me kirne dojeh bicarek welat  
Nehiştin bixwênin ko em neçne pêş  
Li ser me giranbûn nexoşî û êş

Didane me derman petat û nivişt  
Bi vî rengî milet seraser birişt  
  
Meger em li jêrin ji sed not û çar  
Hemî dest qerêjin perîşan û jar  
  
Nezan û reben, parsek û karkerin  
Hemî hov û hirçin ko ew râberin  
  
Li pey wan diçin em hejar û weza  
Ne hozan û pêzan, me da pey diza  
  
Bira zû şiyarbe, bibe markisi  
Çiman dê bixwî tu tim nanê tisî  
  
Xebata meye zanibe sade zêr  
Çiman ew li jor û çira em li jêr  
  
Ji ber ko nezanin didin pey gura  
Bixwêne, bibêne çiye ev, bira ?  
  
Çi tiştên bi kare ji karên teye  
Tenê dar bi destê neyarê teye  
  
Bizan ew dehin lê emin sedhezar  
Dikarin hesanî bixin dest xwe dar  
  
Gemar û qelêr tev dibin zîv û zêr  
Ne şerme ko rovî siwarbî li şêr?  
  
Bi hevre li karbin bi rist û dirist  
Mebin gewşek û xwar û rûsar û sist  
  
Bibin partiyek tev, heçî em li jêr  
Bi destêن xwe bigrin hemî tevr û bêr

Bi êrîş herin pêş wekî pehlewan  
Çi nêçîr û hêlê bikin em li wan  
Hemî rencber û tazî û bêkiras  
Herin dijminê kurd bi çakûç û das  
Ku qata bilind carekê hilweşî  
Bi şadî dijîn em bi xêr û xweşî  
Ne zorker, ne birçî di nav me nebin  
Heçî ko di gel me dijîn, wek me bin  
Ewê ko ji bo me ji dil kar bikî  
Bi rist û diristî, ewê kar bikî  
Bi kok û bi binyad mezin nabî kes  
Di nav me nemênin peyayên teres  
Bizan şêx û axa ne kurdperwerin  
Ne xêrxwaz û dilxwaz, ne jî rêberin  
Heçî bo me başe, me jê dûr dikin  
Di nav me neyarî gelek kûr dikin  
Divêñ em şerêñ hev bikin wek berê  
Ji bo ko bikarin me derxin ji rê  
Dixwazin li pey markisî em neçin  
Li her der dibêjin ku em tev leçin  
Neraste wekî ew dibêjin, bira  
Dixwazin bixun ew me rengê gura  
Çira ew li jor û çira em li jêr  
Şev û ro bi destê me çakûç û bêr

Çira em perîşan û bê xan û kinc  
Bixun nan û zater, belê ew birinc  
  
Li ser me timî kar û kar bo ewan  
Li ser me dibin Kohreş û Erdewan  
  
Çi qatek perîşan û jar û reben  
Bi destê me nîne bihayê kefen  
  
Bilûrê ci lêxim ji bo gayê sor ?  
Çira me ci ronî didî çavekor ?  
  
Ku çil sale ez wer dikim qîre-qîr  
Belam ez ci bêjim ji bo gayê qîr  
  
Eger min di virde ne xweş gotiye  
Belam we dilê min gelek sotkiye  
  
Hemî kes li her der sivik çûn pêş  
Kerê min hejare xwe naghêni êş  
  
Bi zanîn û tore hemî çûne jor  
Tenê em perîşan û di bin dar û zor  
  
Ji lewra dema ko kela dil diçê  
Ji bo we dibêjim du pirsên neçê  
  
Biborin di min xwendewarê mezin  
Eger şiv li hespan nedî nabezin  
  
Dema ez dibênim kurê Erdeşêr  
Di bin destê dijmin dibî qelsêmêr  
  
Çiqas ez dixeydim, çiqas dilnexwes  
Seraser dilerzin ji min can û les

Dixwazim bibim pêt û pijqîn û ar  
Bisojim riwê dijminê pir xedar

Ku çawa dibênim xwe ez jar û kêm  
Bi him-him ji jorde bi ser kurdde têm

Dibî ez nezanbim, ne xercê şerim  
Dibî bargiranbim nikarim herim

Tenê ez ji bo we timî wer dibêm  
Li min megre qurban, çi zêde çi kâm

Bizane gelek dost û hem yarê kurd  
Wezame,bezame di bin barê kurd

Dikarî tu bêgem li min bî siwar  
Bi nanê zikê xwe dikim bo te kar

Belam ez ne hovim, ne jî paşde mam  
Li ser awira xwe diçim bêgeram

Dema ko xebata we pir xweş dibî  
Riwê min wekî sorgulan geş dibî

Meger tal û şêrîne ev mîwe ber  
Ji xwîna dilê min hemî têne der

Ne ko min dizîne, ne kes daye min  
Dixwazim bixwênin hemî mîr û jin

Heçî pak û başin ji bo xwe bibin  
Heçî ko nebaşin bidin ber bi min

Dibêjin rûnek genîbî te dî  
Li ser nanê deyne bide dest xwedî

Bizane dema markisi hatiye  
Bi ristin, bi hûnan me ev patiye  
Nikarim bibêjim ji bo te hemî  
Di virde dibêjim bi kurt û kemî  
Dixwazim şiyarbin, bibin rêçevan  
Ji bo ko nebin em pezê bê şivan

## AJOTİN Â AVJENÎ

Bibe ajiwek pir şiyar û çeleng  
Tu her tiştî, bajo ci lorî, ci teng

Dibî rojekê ev bi kérî me bê  
Nikarin xelasbin ku ev rê nebê

Gerokê, firokê tu bajo heval  
Bibe ajiwek pir çeleng û şepal

Li hespê siwarbe, bibe pehlewan  
Divî karê hande çunîne ziyân

Dibî rojekê ko li te teng bibî  
Li hawîr te qîr û şer û ceng bibî

Bi hespê xelasbî ji nav dijmina  
Weyaxud xelaskî li ser wî hina

Eger ko gerokbî ji xwe çêtire  
Bizane ku kara ewê bêtire

Tu kemyonê bajo ci kara meye  
Ke xwarin û leşker hemî têdeye

Eger tangê bajo bi pêşde herin  
Bi ser dijminande birêjin mirin

---

Çiqas payedarı bi tang û bi top ?  
Tu guh dêre herçî dibêm bê dilop

Ku êrîş bibî ser neyaran ji dil  
Divê ko te xurtbin pî û dest û mil

Li ber te xwe nagrin, ne av û ne çem  
Eger avjenî zanibî gav û dem

Di avêde carek gemî perçebî  
Tu namrî, ku carek li xwe ewlebî

Dikarî xelasbî ji avên çema  
Hevalên xwe derxî ji derya xema

Bibe avjenek pir şiyar û sivik  
Tu hînbe gera kundir û hem zillik

Hevalên xwe derbaske wek pehlewan  
Bikêrî me tê xweş di rojên giran

Bizane ko kara meye avjenî  
Eger zanebî vê bi min nakenî

Serê xwe bixe kundirek ey bira  
Nizanin çiye wê bibêñ kundira

Zilê deyne ber dev tu ey xurtemêr  
Çi zanin çiye ko diçî ber bi jêr ?

Bi kundir, bi zillik dibî payedar  
Dikarî di binve herî ber neyar

Çiqas avjenî zanibî başe ew  
Ewê ko nizanî, wekî laşe ew

Hevalan tu derbaske lê hin bi hin  
Bere bêne kuştin, çiye ev mirin ?

Bi zendên xweyêñ xurt tu avê bijen  
Bi çekve me derbasbike rû biken

Tu hînbe bibe avjenek pî sivik  
Hevalên xwe derbaske xort û keçik

Heye rojekê em herin ser çiya  
Neyarêne me bigrin delav û riya

Di avanve derbasbibin pehlewan  
Di rojêne şerande di nîvê şevan

Eger hin nebin zanibin avjenî  
Kiyê me xelaskî sivik ezbenî

Ji bo partîzanan gelek raste ev  
Ji bo nijdevanan gelek raste ev

Bibe avjenîzanekî serbilind  
Di nava hevalan bibe qenc û rind

Tu ajobe, avjenbe ey serfiraz  
Me derbasbike, da bijîn em bi naz

Şerê dijminê xwe bikin wek piling  
Ji hawîr bigorin li wan qîr û deng

Di avêne çemanve herin em bi mil  
Şerê dijminê kurd bikin mîreşil

Tu barxane derbasbike wî rexî  
Di avêde mîrbe ji ser xwe nexî ?

Ku ajo û avjen gelek payedar  
Nebî ko tu vana nebêni ji kar ?

Çi karê hebî kare ger zanibî  
Ziyana me têde heye, yan dibî ?

Çi dezge di iro heye hîn bibe  
Li nav hevdemêñ xwe tu şêrîn bibe  
  
Çi karî bizanî dibi serbilind  
Li bajêr tu rûnî weyaxud li gund  
  
Dibêjim ji bo te bi kurt û kemî  
Nikarim bibêjim bi ristin hemî  
  
Di virde du, sê mew me çandin di rez  
Ku rista me tenge dibazim bi lez

## NEÇİRVANÎ

Tu nêçîr bike tim li jorê çiya  
Tu şêran birînke digel kovîya  
Metirse ji xûnê, mebe diltenik  
Bi xûzî here yan li ser dest û zik  
Dibî pehlewanek bi tirs û bi saw  
Li şêran dikî tim tu nêçîr û raw  
Ji xwarê dikarî herî ber bi jor  
Ji ber te birev dê biçin sed evor  
Dibî xurtemêrek, tu guh nadî xem  
Li ser xwe tu nahêlî zor û setem  
Ewê hînî nêçîr dibî pehlewan  
Bikêrî me tê ew di rojên giran  
Tu xwînê birêje, mebêje guneh  
Ku çavek bi sed çav û destek bi deh  
Mebe rîgir û kerdizê ser çiya  
Xwe mespêre dijmin wekî resmiya  
Bibe xortekî serbilind û mezin  
Bi ristên xwe bêjim ji bo te pesin  
Tu nêçîr bizanî gelek başe ew  
Cihê pesn û fortan û şabaşe ew  
Dema dijminê te ji ber te şikest  
Li her der dimenî perişan û mest

Tu nêçîr li wî tim dikarî bikî  
Li her cî dikarî şiyarî bikî  
  
Serê dijminê xwe bixî teşqela  
Li min guh bidêre, ci şêx û mela  
  
Tu hînî şeranbe ku nêçîr dikî  
Dibî dil ji hasin dema qîr dikî  
  
Bibe xurtemêrek ji polabî dil  
Mebe dewlemedek ters, dil bi kul  
  
Tu xwînê birêje metirse tu car  
Bizane ku dijmin tenê koledar  
  
Tu nêçîrê lêke bi roj û bi şev  
Di vê rê destê xwe tev bidne hev  
  
Ewê ko welatê te girtî bi zor  
Wekî koledare li jêr û li jor  
  
Şerê wan xurtî bike gav û dem  
Ji ser xwe tu rake bi zorê setem  
  
Tu nêçîr bizane ji bona çiya ?  
Ji bo pir sivikbî di cenga çiya

## SEGVANÎ

Tu nîşanê bigre bicî, bemedé  
Tivingê tu bigre werîn berxwede  
  
Tivingçîbe carek bi nav û bi deng  
Ku çavnêre her dem ji bona me ceng  
  
Tu armancê bişkîn meger mûye ew  
Çiqas hûr û dûre ku yeksûye ew  
  
Tu hînbe tivingê, veke, çêke xweş  
Bibe partîzanek ne diz û keleş  
  
Bike dijminê te bitirsî ji te  
Li her cî û şûnan bipirsi li te  
  
Tu armanc şikînbî di rojên şera  
Şerê dijminê xwe bike ey bira  
  
Tivingê tu berde metirse ji deng  
Metirse ji topa, metirse ji ceng  
  
Tu derzî ji qadê hilîne bi ber  
Tu bişkîne dijmin bi nîşan di şer  
  
Mehêle tivinga te bigrî qerêj  
Şerê dijminê kurd nekirye ji mêt  
  
Tu paqijke carek bi don û bi paç  
Bike deng bidî ser çiya û qelaç  
  
Tu bişkîne nîşan serê dijmîna  
Bi tirs û bi sawbe wekî Bacina

Bihingêve sînga neyarê welêt  
Bikin ko welat lê bibî ar û pêt  
  
Tu çavê çepê bigre, rastê veke  
Li kêlê tu tûj û dirist meyzeke  
  
Tivinga xwe bigre bi destê çepê  
Dilê te bere qet nekî teprepê  
  
Binê kêlikê xweş tu bigre bi cî  
Bike ko ne rast û ne çep qet neçî  
  
Bide ber devê wê ji bin mûyekî  
Tu tirsê bi serde divê rûnekî  
  
Metirse ji dijmin, wekî te mirov  
Bi nîşan tu berdê gelek hûr û tov  
  
Ne polaye, ew jî ji hestî û goşt  
Li devxe, mebêje gelek oşte-oşt  
  
Eger win gihan hev di erxê bibez  
Bi singo şerê wî bike yan bi gez  
  
Metirse çiqas ew bilind û sitûr  
Devê navziravê sivik têxe ûr

## FİZİYA Û KAREVA

Tu fîzya bixwêne hevalê çeleng  
Xwe karke bi hevre ku em herne ceng  
  
Eger fîzîya em nezanin çilo  
Dikarin herin pêş bi xurtî gelo ?  
  
Bixwêne şiyarbe ku em herne pêş  
Bi pijqîn û atom, bi tang û bi gêş  
  
Bi xurtî digel dijminan şer bikin  
Bi pijqîn guhê dijminan ker bikin  
  
Bibe fîziyayî, mirovek mezin  
Bi te payedarbin ci mîr û ci jin  
  
Tu sarûxê çêke, ku pir dûr herin  
Nebes fîziyayî ji bona şerin  
  
Resedxane deyne li kûpêñ çiya  
Bikêrî me tê ey bira fîziya  
  
Tu gewher bi zanîn ji hev perçeke  
Tu qada welatê xwe pê firçeke  
  
Bike hatina me bibî çarde qat  
Hebûnek bi zanîn felata welat  
  
Ser û bin bikin rewş û pergal û jîn  
Bibin dewlemend em li royê zemîn  
  
Di nav miletande bibin serbilind  
Wekî hev bikin em, hemî şar û gund

Hemî nifşê xwendin bixwîne teva  
Belam zêdetir fîziya, kareva  
  
Çi tiştên ku başin bixwîne timî  
Welatê me ronî dikan ew hemî  
  
Şevan bikne wek roj û rûgeş bikin  
Dilê xort û qîzan bi wan xweş bikin  
  
Li ser rê, li ser şax û kûp û çiya  
Bikin ronî û xweş bikin her ciya  
  
Çi karê hene em bi wî bidne pêş  
Di nava welêtde nebin derd û eş  
  
Bere fabrîke xweş bi wê bêne saz  
Di karxaneyande bibin serfiraz  
  
Dirêjkin li gundan, şevê bikne roj  
Bibin wek bihiştê zinar û beroj  
  
Ne reşkê şevê bêñ, nejî pîrhevok  
Di jorêñ çiyande vebin çâ û çok  
  
Ne pîra mirov xwer bimêñî, ne can  
Li herder ku ronî bidî ser cihan  
  
Bixwîne bira kareva qenc û baş  
Çira em neçin pêş, bimêñin li paş ?  
  
Bizane ku pir başe ev kareva  
Çi karek girane ji bo me teva ?

## LÎZTÎK Û YARÎ

Bilîze bi yarî, bibe pî sivik  
Şerê dijminê xwe bike pir bi rik  
  
Sivikbe di lîzê, li xwe agedar  
Bizane li kûne heval û neyar  
  
Çira ez dibêjim bibe lîzevan  
Ji bo ko di şerde bibî pehlewan  
  
Lebatê di laşê tede girs û hûr  
Bi pêşve herin ew ci xurt û sitûr  
  
Di rojên şerande dibin alîkar  
Ji hawîrve êrîş dibin ser neyar  
  
Bi lingan tu lêde, bi dest û seri  
Eger ko wesa zanibî şerkerî  
  
Heçî lîzevanin çeleng û şiyar  
Dizanin hemî lîz û xapên neyar  
  
Şiyarbe li dostan, biparêze xwes  
Li hember neyaran çeleng û keleş  
  
Cihê ko wezaye tu êrîşke ser  
Berî ko tu êrîş bikî xweske şer  
  
Bi lîz û bi yarî dibî pehlewan  
Çilo bejn û bala dibin xwes ciwan  
  
Tu gangîr mebe tim bi razan û xew  
Heta ko nebî pir sitûr û qelew

Bilîze, bibaze, bi dest û piya  
Eger karibî tim here ser çiya

Bibe pehlewanek sivik û çeleng  
Heye ko ji nişka bibî qîr û ceng

Xwe çenke, xwe bavê wekî pehlewan  
Bide ser milên xwe ci tiştên giran

Mebe nazik û şeng û terxan û kal  
Xwe hînî delalî meke ey heval

Mebêje nexoşim, mebê bûme pîr  
Di jînêde her dêm bibe xurt û jîr

Bi lîzê dibî xortekî jîr û rind  
Di rojêñ şerande dibî serbilind

Tu çavêñ xwe meşkîne carek ji kes  
Mehêle li laşê te bigrî nemes

Sivikbe, giranbe di rojêñ şera

Tu êrişî dijmin bike wek gura

Eger xweş bizanî tu yarı û ger  
Tu natırsî carek dema ceng û şer

## OLA MİN

Xwedê nîne wek ew dibêjin, xwedî  
Kiye ê bikarî cihanê bîdî ?

Cihan her hebû, her heye, wê hebî  
Hebûn wek cihane xwedê têdebî

Nebûn nîne carek ku tevger heye  
Diborin, digorin jiyîn her weye

Tu bawer meke wer çu peyxambera  
Tenê zanibe wan wekî rêbera

Gelek jîr û zana û daxwaz mezin  
Mirovên nexwendî sewal û pezin

Heçî ol û rêçik hene tev derew  
Yeke rast gunîne, ne ev û ne ew

Tenê tev ji bo qencîyê hatine  
Dil û cerg û canê xwe tev patine

Dixwestin mirovan bibin ber bi pêş  
Belam tevde bûne nexoşî û êş

Li ser wan gelek pevdîçin hov û dîn  
Eger ko dixwazî bizanî, bixwîn

Mirov tev yekin gewr û sor û reşik  
Bicarek birane reşik hem xweşik

Niha zanibe ol mirovaniye  
Weharenge qencî dilovaniye

Ji herkesre çêbe ji her rêç û ol  
Tu ola xwe mefroşe carek bi pol  
  
Şerê zorkeran xwes bike ey ciwan  
Berê xo bide herçî tiştên ciwan  
  
Welatê xwe derxe ji destê neyar  
Ji bo her mirovî bibe dost û yar  
  
Çi tiştê ziyan pê li yek dî bibî  
Emanet, nebî ko tu nêzîk bibî ?  
  
Wekî dî ci tiştê dixwazî bike  
Heçî ko ne qence, ne başe, meke  
  
Di kar û di pîşde bi pêşde here  
Ji qadê, ji madê, tu wêde mere  
  
Di dehma xwedêde meke devjenî  
Tu kara te nîne bi wê ezbenî  
  
Mebîne mirovan hemî hevrikin  
Çi başe ji bo wan divê em bikin  
  
Şerê xo û miqrop û tarî û zor  
Bikin em li her der li jêr û li jor  
  
Beg û şêx û axa, diz û zorkerin  
Di çavên mede hê wekî rêberin  
  
Şerê wan bike ey kurê xwendewar  
Hinek dijmin û hin hevalên neyar  
  
Hezar sale milet hemî rotine  
Welatê me yekser hemî sotine

Digel dijminê derive dost û heval  
Evan dane dijmin hemî qad û mal

Mirov tev du qatin û qatek li jor  
Hemî tişt ji wanre diriste bi zor

Ji dijminre bindest û kola û seg  
Li ser me dibin şêx û paşa û beg

Welat perçe, perçe kirin wek reza  
Em û xwe bi hevre sipartin diza

Serê xwe ji wanre tu dameyne, bes  
Mede pêşîya xwe mirovên teres

Ji wan herçî basın dizanim evin  
Ewêñ ko digel te di vê rê kevin

Xwe wek te bibênin, wekî te bijîn  
Di vê rê bi hevre bibin xwînrijîn

Ji qata xwe bêñ xwar bi dilpaqijî  
Bi pakî û rastî di gel me bijî

Belam ê ko carek li jorê xwe dî  
Li palan bicarek xwe nakî xwedî

Dibî rencberê dijminê payedar  
Xwe nakî hevalê weza û hejar

Ji dijminre carek meger rencbere  
Li ser me nezana beg û serwera

Devê xwe ji alif dixî der kerek  
Heta ko di berde hebî neşxwerek

Ji dev derxe carek bi destan cuher  
Bi fîq-fîq li pey te diçî nêreker

Heta ko tu dest û piyan maç bikî  
Ewê mal û paya te tarac bikî

Ji bo te dibêjim di van sale sî  
Emanet xwe mespêre destê kesî

Bixwîne, bibîne, bizane cihan  
Keçek pir şirîne, qelen pir giran

Tu bustanê serbestiyê xweş bibîn  
Gul û çîçekin sor û zerbûn bi xwîn

## ROJÎ Û NÎMÊJ

Ne rojî ewe ko xwe birçî dikî  
Belam zanibe ka ji bo çî dikî ?

Diriste ku rojek li me teng bibî  
Bi qêrîn û halan şer û ceng bibî

Ne nan û ne qet bi destnakevî  
Nikarî ji tırsan demek rakevî

Eger rojîvanbî dikarî nexwî  
Eger ko nexwî ma çiman dê vexwî ?

Ji ber ko tu hînî nexwarin bibî  
Tu bê xwarin û hem vexwarin bibî

Bi vî rengî karî tu dilxurt bijî  
Dilê te li ser xwarinê nabijî

Bi rojî be her dem tu, zik têr meke  
Li ber xwarinê tim xwe bêkêr meke

Tu parêzê bigre ji tiştên bi rûn  
Eger ko bixwî jî, bixwe nerm û ron

Geya û ber û sebze bêtir bixwe  
Çığa ko bi xurtî bikarî bixwe

Çi tiştên ko têde vîtamîn heye  
Bixwe ew ji bo te gelek fêdeye

Ne dagre, ne vala bihêle tu zik  
Ji şor û tewâşê xwe bigre bi rik

Bi roj û bi şev hîn bibe ko bixwî  
Ne raste ku îro wekî do bixwî

Bi rojî be carek tu avê vexwe  
Eger karibî xwe bicarek mexwe

Ji heftê tu rojek nexwî çêtire  
Di virde ku kara te her bêtire

Ne rojî ewe ko tu zik têr nekî  
Divê herçî tiştê ku bêkêr nekî

Ne xweş rojîye ko bi rojê nexwî  
Dema ko dibî şev kilojê bixwî

Zikê xwe tu valabihêlî bi roj  
Ko banga melê da, bikî çal û doj

Bi roj û bi şev qence hindik bixwî  
Tubihna xwe berde ko avê vexwî

Mexwe herçî tiştê bi don û giran  
Tu qenc hûr bike wî bide ber diran

Gelek qence rojî xwe lê hîn bike  
Wekî ez dibêjim, ne wek dîn bike

Nimêjê bizane wekî tevgere  
Çi xweş rewş û pergal ji bo leşkere

Xwe rake xwe deyne, li rast û li çep  
Bi sîng û bi ser hem bi laş û bi lep

Bi rext û tivingêve berjor here  
Sivik ko tu çûyî, sivik jî were

Bi lingan bi destan bike tevlivî  
Ji jorê çiyêde sivik dakevî

Bi paşve, bi pêşve bibe xwar û xûz  
Bigoçe bi serhevde wek kûp û kûz

Bi destê xwe bigre tu bêr û bivir  
Tu axê bikole ji hawîr kevir

Tu daran biçîne, ciwan xwes vekî  
Tu kincêن xwe paqij bikî, yan nekî

Çi karî bikî ew nimêja teye  
Çi tiştê didî hev qerêja teye

Ji heftê tu rojek here ser çiya  
Xwe berde newalan wekî kovîya

Sivikbe, bilindbe, bezabe li rê  
Tubihna xwe berde ku çû ser kurê

Nimêj ne ewe, ko tu ber dî kevir  
Nikarî bikî ko xwedê bête vir

Çiqas karibî ko bikî tevgerê  
Li jorê çiyêbî weyaxud li rê

Ji bo xwe çi karî bikî, ew nimêj  
Xwe paqij bike tim, ne başe qerêj

Ji heftê tu carek xwe paqij bişo  
Bi sabûn û avê bike wek deşo

Riha xwe tu tim kur bike pak û baş  
Riya sofiyê reş bide ber teraş

Giranbe, ciwanbe, mebe ser gever  
Di bin barê dijmin mebe guhçeper  
  
Bibe partîzanek gelek xurt û baş  
Di karê welêtde bibe rengê aş  
  
Li ser te bi qencî bibên mîr û jin  
Li nik min eve ew nimêja mezin  
  
Li mizgevt û dêran çiqas rakevî  
Ji bin destê dijmin tu dermakevî  
  
Tu destê xwe bavê tivinga zirav  
Xwedê jî ji bo te dibî dê û bav

## BERÊ RES

Berê reş nizanim tu pê bawerî ?  
Ku rovî dimîzin li ser vî berî  
Ji mêtve ji tazîre pût û senem  
Ku agirperesbûn çi kurd û ecem  
Ji bo te bibêjim bi zêr û zeber  
Tu dîlî ji lew ser dibî pêşî ber  
Senem bo niha jî bizan ew senem  
Bi pîsî serê xwe dibin ber ecem  
Bizane hemî pîs û kêm û nexwêş  
Serê xwe dibin ber berê xav û res  
Tu malê xwe nadî ji bo xwendinê  
Tu guh nadî carek li tolsendinê  
Didî Sûriya, Urdin û hem Hicaz  
Li mal zariwên te dikin gaze-gaz  
Ne şerme serê xwe bidî ber kevir  
Ku bêjin te navek li xwe zêde kir  
Tu kêr çûyî, dûzan vegerya welêt  
Çikûsî çiqasî li bejna te têt ?  
Di xap û derewde dibî pehlewan  
Hezar tif li ser te, hezar tif li wan  
Ewêñ ko dibêjin ji bo te here  
Neyare ji bo te, ne ko rêbere

Biya min bike, ka were ey hecî  
Perêن xwe tu xercke li vî war û cî  
Bike qesr û qûnax û xanêن bilind  
Veke xwendegahan li bajar û gund  
Bere lê bixwenin hemî qîz û xort  
Li ber kar û berxan nekin qote-qot  
Di pesnê tede çêbikin em nivişt  
Ji bo te di rojêن şeran bibne pişt  
Welatê xwe ava bike dewlemend  
Hezar sale dijmin ku malê we send  
Bese zû şiyarbe tu îro ji xew  
Çira guh didî van niviştên derew  
Bixwîne, bibîne ci rast û dirist  
Ji dijminre jend û ji dijminre rist  
Serê xwe ji xew rake zû ey bira  
Bikin em bihevre şerê van gura  
Bi zanîn û xwendin herin ber bi pêş  
Tu arvan mehêle li benda qerêş

## MİHEMED NEÇÜYE EZMANA

Kesek naçî ezman bi boraq û ker  
Ji bîra xwe bavê kerê guhçeper  
  
Mihemed ne çûye, ne jî karibû  
Xema miletê xwe ewî xwaribû  
  
Mezin bû, giran bû gelek bîrewer  
Ku Quran wî çêkir bi zêr û zeber  
  
Perîşan û jar û weza û geda  
Kirin wek bira wî bi navê xweda  
  
Bi şûr û bi dev wî dikir kîferat  
Hicaz û Yemen wî kirin yek welat  
  
Di rojêñ şerande gelek jîr û mîr  
Ji êlêñ erebre xwe wî kir sitêr  
  
Belam pir li ser wî civandin derew  
Derew, lê gelek xurt û girs û qelew  
  
Dibêjin, ku wî xweş xwedê dîtiye  
Belam ew nizanî kîye? yan çiye ?  
  
Xwedê ger hebî dê li her cî hebî  
Çiman wê di ezmanê heftande bî ?  
  
Ne raste bibêjin ku Peyxambere  
Belam em dikarin bibêñ râbere  
  
Wekî me mirove, ne tav û ne can  
Çilo ew siwarî çiwe asîman ?

Heçî xwendevanê li pey hatine  
Gelek tiştê pak û şirîn gotine

Belam perçe kirne ewan ol û dîn  
Belavbû bi xurtî heta Hind û Çîn

Meger bûye destûr û qanûn û rist  
Belam piştî wîre gelek maye sist

Derew pir di navde bi baran hene  
Wekû ba û baran û tavan hene

Hemî hevrik û dilbijan û bi gir  
Di navde xuyane gelek zér û dir

Belam wî ji ên pêşî xo girtine  
Heçî pak û qencin wî wergirtine

Berî wî jî Zardeşt dibêjî wesa  
Belê wî guhaztin ji dev çend kesa

Siwarê kerê reş şivanê bedew  
Nikarî herî jor bi fort û derew

Di iro tu bawer bike vê ji min  
Mihemed mirove sezâ û mezin

Belam xweş bizane ne peyxambere  
Şehinşah û zana û xweş rîbere

Bi zanîn mezin kir welatê ereb  
Li pey wî belavbûn li rast û li çep

## EVİN Ü EVİNDARİ

Evîndarbe, her dem xweše ev evîn

Evîn ko nebî em çilo dê bijîn ?

Evîn pêt û arek bi hêz û bi tîn

Dilê dilbijokan disojit evîn

Cihan tevde jîn û evîn û hebûn

Nizanim çilo ev li me peyde bûn

Divêm ez bixum hem dixwazim bidim

Çi tiştên ko xwesbin divêm bernedim

Bikim ez, bidim ez, bixum ez xwesî

Ji her kesre pêşkêş bikim ez geşî

Di virde hevalin hemî mîr û jîn

Xwedî par û pişkin biçûk û mezin

Ger û lîz û xwarin û razan û xew

Ji hevre dibêjin ci rast û derew

Ne bes em tenêne, hemî nîr û mî

Di jînêde herkes xwedî bav û dê

Evîn ger nebî em çilo têr hebûn ?

Hebûn her heye lê dibî zêdebûn

Evîna te kuştım cihana şirîn

Evîndare wek min heçî bête jîn

Di jînê ci xwêstir heye wek evîn

Eger ko nebî ew, ci hêjaye jîn ?

Dijîm da bixwazim heme da bivêm  
Evîne di jînêde wek mûç û êm  
  
Ku sêvê dibênim divêm ez bixum  
Ku lêvê dibênim divêm jê vexum  
  
Dixwazim ku hembêz bikim koçerê  
Bibore di virde ku dergûm ji rê  
  
Mirovim dixwazim bijîm wek mirov  
Di virde wekî hev dijîn hirç û hov  
  
Hemî em dixwazin, hemî em divên  
Hemî laşekin tev bi hêz û bi têr  
  
Hemî hev dixwazin, hemî hev dixun  
Wekî fil û ferzîn û hesp û rexin  
  
Li pey hev diçin em her û her eve  
Ku dawî çunîne cihan wek şeve  
  
Dema gur dixwî pez ji wê hez dikî  
Li kû ew dibêni li pey bez dikî  
  
Tu sêvê dixwî çon bi te xweş dibî  
Riwê gur bi berxê wilo geş dibî  
  
Evîna jin û mîr gelek hare ew  
Pirîsk û birûske çi dijware ew  
  
Di laşê mede ew çi pêt û pereng  
Ku Zîn û Şîrîn û Xecê, dane deng  
  
Bi destûr û bend û bi rist û bi ben  
Jin û mîr girêdan perişan, reben

Di nav mîr û jinde çi sênc û kelem ?  
Bi vî rangî kuştin hezar Zîn û Mem  
Li hawîr me çember, li hawîr me dav  
Li wan hove nadin, evîn şewq û tav  
Ne zindan û girtin, ne lêdan û dar  
Ji hev dûr nexistin evîndar û yar  
Disojit dilê min evîna welêt  
Ciger daye ber xwe, hemî ar û pêt  
Dixwazim bijîm ez, ne bindest û dîl  
Di qada xwede ez bibim Berdewîl  
Evîndarekim pir bi tîn û bi hêz  
Li ser vê şepalê me rist kirne rêz  
Evîna me tev agire pir şewat  
Evîna welat û evîna felat  
Ejî wek Memê keçperestim ji dil  
Ji bona Xocê ez dibim dil bi kul  
Li ser vê şirînê dikolim çiya  
Şirîn û Xec û Zîn bi min Mîdiya  
Ji herkesre yarek heye pê dijî  
Ji wêre dinâlî bi dilpaqîjî  
Cizîrî ne wek Xaniyê dilbirîn  
Ku Nalî ne wek min ciger bûye xwîn  
Ku bilbil li ser gul dikî ah û qîr  
Ne wek min di vê rêde hevdeng û bir

Hemî kes di jînê evîndare xweş  
Birîndarê tîrên ji çavêن di reş

Hinek reş dixwazin, hinek kesk û zer  
Hinek xêr dixwazin, hinek ceng û şêr

Ewê şer dixwazî evîndare xweş  
Çi sorgul bixwazî, ci reyhane reş

Evîndare şêrê dirind û mezin  
Dixwazî bixwî bes ci mîr û ci jin

Dema av diçî ser gulê geş dibî  
Ku tama devê me bi xwê xweş dibî

## BAZİRGANI

Kirîn û firotin xweşin kake can  
Çilo pêşveçûye li hawîr cihan  
Bi bazar dibî jîrek û bîrewer  
Tu karê xwe karî bikî tim xweser  
Cihan çêleke, lê kiye ê ko dot ?  
Ewê ko bi zanîn kirî û firot  
Li şaran tu rûne bibe şareza  
Mebe gundişek pir nezan û weza  
Tu çavêن xwe belke, şiyarbe ji xew  
Di destêن begande mebin çêlekew  
Li bajêr tu rûne di birca bilind  
Li mala xwe deyne heçî pak û rind  
Xwe paqijke carek ji kevn û gemar  
Bi bîr û bi bawer bibe hoşiyar  
Kirîn û firotin çi karek mezin  
Ne wek bax û bustan û dar û rezin  
Çiqas wer bimêni bi şem û fedî  
Di destê neyaran dimêni kedî  
Di bazarde jîrek dibî cansivik  
Tu nêçîr dikî xweş di avêن girik  
Tu bistêne arzan û bifroş giran  
Di karê xwede xweş dibî pehlewan

Ne şêx û ne axa nikarin bi te  
Cihan xoş û pîroz dibî tim li te  
  
Kur û keç bi hevre bişîn xwendinê  
Tucaran girêkan mede ber jinê  
  
Bi hevre bi qencî herin mîr û jin  
Ku herdû di jînde gelek paqijin  
  
Bere jin di karde xwedî par bibî  
Li bajar û bazar xwedî kar bibî  
  
Mebêjin ku şerme çilo kar bikî  
Divêtin ku wan jî tu hişyar bikî  
  
Bere serbilindî di her iş û kar  
Di bin darê mîran nemînen hejar  
  
Bi kar û bi bazar dibî pehlewan  
Dibî borcewazek xwedî sermiyan  
  
Tu wê çaxê karî gelek kar bikî  
Ewê ko di xewde, tu hişyar bikî  
  
Kirîn û firotin di her kar û iş  
Bi wan hîn dibî ey heval, xap û pîş  
  
Bi canbazîya xwe tu jîrek dibî  
Çi mîrek çelengbî, ci pîrek dibî  
  
Tu arzan bikir lê tu bifroş biha  
Yeka te divê ko bidî ser deha  
  
Bi ser hevde komke bike sermiyan  
Li her der bi çakî dijî sermiyan

Welatê xwe karî gelek xweş bikî  
Keç û cam û bade tu axoş bikî  
Serê te bilinde ku camêr bibî  
Di nava hevalan wekû şêr dibî  
Bi dijminre karî bikî ceng û şer  
Bi tîp û bi top û bi mal û hiner  
Bi malê te milet dibî payedar  
Welatê te pêkve dîbit gulizar  
Ziman pêşve gavan sivik radidî  
Hezaran riyên hasinî radidî  
Keç û kur bi hevre dibin xwendewar  
Ji nûve dikarin bibin berxwedar  
Ku petrole zêrê reşê pir giran  
Tu bistîne carek ji destê guran  
Bere dewlemend bî xwedî mal û zêr  
Welatê te ava dîbit xêr û bêr  
Tirêن û firok û gerok pir dibin  
Ji dijmin hezar qatî xurtir dibin  
Tu bifroşe derve, ji derve bikir  
Divê kar bikî hem ji vir, hem ji wir  
Bi destê xwe bigre tu hevsar û kar  
Di nava cihande dibin payedar  
Tu dolabgerîn bî gelek çêtire  
Mebîne ku dijmin ji te bêtire

Bi malê xwe karî bibî serbilind  
Li herder bi pêşve bibî şar û gund  
Li darxî tu karxan û fabrîkeyan  
Vejîne welatê Medan û Keyan

www.netewe.com

**WEŞANƏN ROJA NU**